REŞİD KURD

# RÊZMAN

# A

## ZIMAN Ê KURMANCÎ

*Bi alîkarî ya çend Ciwanmêran hate çapkirin*

1956

REŞÎD KURD

DIYARIYA
OFFERT PAR

# RÊZMAN A ZIMAN Ê KURMANCÎ

*Bi alîkarî ya çend Ciwanmêran hate çapkirin*

1956

Çapxane ya KEREM

# Xelet ên çapê

| Rûpel | xêz | xuar | rast |
|---|---|---|---|
| 11 | 20 | ( i ) | ( î ) |
| 18 | 17 | pewendan | pêwendan |
| 19 | 21 | hewrêz | hevrêz |
| 21 | 5 | Nav êm | Nav ên |
| 21 | 8 | b)Nan ên | b)Nav ên |
| 24 | 6 | şiko | çiko |
| 24 | 12 | ker î | kerî |
| 34 | 14 | bab e | babet |
| 36 | 1 | mêzane | nêrzane |
| 36 | 6 | beraş | beroş |
| 36 | 8 | mêzane | nêrzane |
| 48 | 11 | nuhokê i de | nuhokê de |

| Rûpel | xêz | xuar | rast |
|---|---|---|---|
| 52 | 1 | bextivar | bextîyar |
| 54 | 21 | got | qot |
| 56 | 15 | 1- Rewç a xurû | 1-Rewş a xurû |
| 68 | 8 | pêvgîh | pêgih |
| 68 | 10 | keşok | kesok |
| 70 | 10 | pêşk | pîşk |
| 70 | 15 | bernawan | bernavan |
| 81 | 21 | pî k ên | pîşkên |

# Pergal a Rêzmanê

I — Rêzman(1), zanîn a peyv û nivîsandinê ye. Ziman li ser hin awa û rêzanan avaye, rê ya van rêzanan, rêzman pêş me dike. Lew ra, jê re, rêzan a peyv û nivîsandin a durust jî tê gotin.

II — Peyv û nivîsandin, ji bo eşkere kirin a dilxuazê û guftêye.

III — Peyv û gotin, pevekan(2) pêk tine.

IV — Pevek, ji pirsan çê dibe.

V — Pirs(3) û peyv, ji dengan; nivîsandin, ji tîpan saz dibe.

---

1 — Rêzman : قواعد اللغة

2 — Pevek : الجملة

3 — Pirs : الكلمة

VI — Pirs bi neh bêş ên neyeksan(1) parvedibe, ku jê re. neh bêş pirs tê gotin.

VII — Neh bêş pirs evin :

Nav(2), zêder(3), bernav(4), rewş(5), pîşk(6), nîr(7), pêrbest(8), pêwend(9), bang(10).

---

1 — Neyeksan : مختلف

2 — Nav : الاسم

3 — Zêder : حرف تعريف

4 — Bernav : الضمير

5 — Rewş : الصفة

6 — Pîşk : الفعل

7 — Nîr : الظرف

8 — Pêrbest : الجر

9 — Pêwend : العطف

10 — Bang : النداء

# Bir I

## Alfabê

1 — Alfabê - hemî tip ên ku di zimên de ne jê re alfabê tê gotin.

Alfabê ya Kurmancî **31** tipin, evin:

a — Ên hûr:

a b c ç d e ê f g h i î
j k l m n o p q r s
ş t u û v w x y z

b — Ên girs

A B C Ç D E Ê F G
H I Î J K L M N O
P Q R S Ş T U Û V
W X Y Z

2 — Du bêş tîp hene dengdar û bêdeng

## — Dengdar

3 — Dengdar, bê hevalî ya tîpne din, ji xueber deng didin.

4 — di Kurmancî de du bêş dengdar hene: dengdar ên xurû, dengdar ên duçeng.

a - Dengdar ên xurû heyştin.

a e ê i î o u û

b - Dengdar ên xurû jî du birin: dengdirêj û dengkurt.

1 - Dengdirêj, dengekî, bilind û dirêj didin dengdirêj pêncin:

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| a | dirêje | di | **av** | de | di | **ba** | de |
| ê | » | » | **êl** | » | » | **rê** | » |
| î | » | » | **în** | » | » | **rîs** | » |
| o | » | » | **ol** | » | » | **col** | » |
| û | » | » | **rû** | » | » | **nû** | » |

2 — Dengkurt - dengekî kurt û nizm didin dengkurt 3 ne. e i u .

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| e | kurte | di | **den** | de | di | **ker** | de |
| i | » | » | **dîz** | » | » | **kil** | » |
| u | » | » | **gul** | » | » | **gur** | » |

### 3 — Dengdar ên duçeng

5 — Duçeng - di hin pirsan de du dengdar ên xurû pev re dengekî didin. Ku ji vì awayî re **duçeng** tê gotin.

6 — Rêzan - di Kurmanci de her çî pirs ên ku sertîp ên wan (X) bin, dengdar ên hinan ji wan bi du denganin, ango du çengin. Duçeng her gav bi dengdar a ( u ) û dengdar ên a e ê î tên sazkirin.

evin : ua ue uê uî

ua = xuarin, xuar, xuas

ue = xueh xueş xueli, xuezî

uê = xuê

uî = xuîn xuîz..

### b — Tîp ên bê deng

7 — Tîp ên ku bê alîkarî ya dengdaran deng nadin jê re bêdeng tê gotin.

Tîp ên bêdeng evin :

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

### c — Tîp ên cêwî

8 — ji van tîp ên bê deng, çendek hene ku dudengin jî wan re tîp ên cêwî tê gotin. Du pirs ên ku tîp ên wan giş yekin, bi cêwîtîê ji hev cihê dibin :

Tîp ên cêwî, an ên du deng evin :

ç k p t r .

Ev tîp ên han dengekî kurt û sist û yekî dirêj û sert didin.

| tîp | nerm (sist) | drêj (sert) |
|---|---|---|
| ç | çem ( ro ) | çem (dar ê gogê) |
| k | ker (ê ku nabihîze) | ker ( dahş ) |
| p | poz, pez | pere, pirç |
| t | tûr, teng, tej | têr, teşt, teşî , |
| r | bar, bêr | tar, bor, zêr |

ji bo van tîpan tu rêzan na ên danin, ev bi bihstin û ezberkirinê çê dibe.

9 — ji bo tîp a ( r ) di pîşkan de rêzanek heye: gava di dû tîp a ( r ) re tîp a ( i ) were wê çaxê ( r ) nerme, gav a ku tip a ( î ) di pê ( r ) re were, evê gavê deng ê wê stûr dibe wek :

| nerm | sert |
|---|---|
| kirin | kirîn |
| birin | birîn |
| xuarin | çirîn |

# Bir: II

## Deng

10—Deng - ji perçe û movik ên pirsekê re deng tê gotîn. Ev perçe û movik bi dengdarekê çê dibe, ku ew perçe carek dî ji hev de nakeve, perçe nabe.

11—Di pirsekê de çend dengdar hebin, ew çend deng hene.

12—Deng - ji vekirinek dev re tê gotin wek: **av** dengeke' çiku gav a ku em dibêjin **av**; dev ê me carekê ve dibe:

av — den**geke**
a — gir **du** dengin
kur — dis — tan **sê** dengin
ba — jar — va — nî **çar** dengin

13—Pirsek, her gav bi dengan par ve dibe, le deng, tu caran par ve nabe

wek: ba — ran **du** dengin
ba dengeke û dîsa perçe nabe

14—Dengek carna bi ser ê xue pirseke :
wek ; ba, av, aş, dar, nan h. p,
Le her deng bi ser ê xue ne pirseke.
wek : **a - gir** du dengin û pirsekin :
le **a** û **gir** bi ser ê xue, ne du pirsin **di-ran**
du dengin û pirsekin, le herdu cihê cihê
ango **di** û **ran** ne du pirsin.

15—carna jî çend deng bi hev re pirsekin
wek : da - ris - tan, bax - çe - van, cot -
kar. ge - nim . . .

## 1 — Yekdeng

16 — Dengdarek, bi ser ê xue dengeke wek:
a e ê i î o u û

17 — Duçeng, bi xue dengeke. wek :
ua ue uê uî . .

18—Duçengek û bêdengek bi hev re dengekin:
xuê xua, xue . . .

19—Duçengek û çend bêdeng bi hev re
dengekin. wek : x**uar** x**ueh** x**uas** x**ueş**
x**uîn**.

## 2 — Pirdeng

20—Pirs ên ku ji çend dengan saz dibin jê re **pirdeng** tê gotin.

21—ji pirs ên dudeng re, d**u**deng, û jî ên sê -deng re **sê**deng tê gotin.

Wek: gi — ran **du**dengin

kur — dis — tan **sê**dengin

# Bir III

**Bir én pirsan**

22—Gav a ku em di peyivin, di nav peyv a me re pir pirs derbas dibin ku hemî bi **neh béşan** hatine par kirin. Ev nehbêş jî, bi **du biran** parve dibin : **Guhêzok, naguhêz**

23—Pirs ên Guhêzok: Nav, zêder, rewş, bernav û pîşkin.

24—Pirs ên naguhêz: nîr pêrbest, pêwend û bangin

25—Pirs, ji van her du biran pêve bi çend reng ên din jî par ve dibin:

ˆ - Bi ditin a pêça wan: **xurû, dumil**

a - Pirs ên **xurû**, ji yek pirsê hatine çêkirin û her di girêdan a xue dedimînin wek: hesp, dar, av, mêr.

b - Pirs ên **dumil**; ji çend pirsan, yan ji pirsekê û **xurdebêj**ekê saz dibin.

26—Pirs ên dumil jî **du** birin:

a - Ên ku ji çend pirs ên xurû hatine pevxistin; ji wan re **hevbend** tê gotin.

b - Ên ku ji pirsekê û xurdebêjêkê hatine pevxistin jî wan re **xurdezad** tê gotin,

27—Her çî pirs ên xurdezad jî du birin: **Nav û rewş** ên xurdezad, **pîşk** ên xurdezad.

a – Pirs ên hevbend

1 - Nav ên hevbend, ji du navan tên saz kirin wek: mar - masî, sîr - dim, ker - guh, guh - dîk.

2 - Rewş ên hevbend: ji navekî û rewşekê tên sazkirin, wek: pez - kûvì, jar - mar, can - giran, rû - nerm.

3 - Ji rewşekê û pirsek din: giran - buha, dûr - bîn . .

4 - Ji navekî û fermanderekê tên saz kirin wek: deng - bêj, mêr - kuj, can - awer

b – Pîşk ên hevbend

1 - Navek û pîşkek, pîşkek nuh saz dikin.

wek: agir - kirin, dar - xistin,

2 - Rewşek û pîşkek, pîşkek nuh çê dikin.
wek: sor - kirin, reş - bûn.
giran - kirin..

3 - Du pîşk bi hev re pîşkek nuh çê dikin.
wek: palî - kirin, kirîn - kirin, cot-kirin..

c - Nîr ên hevbend

1 - Du nav, du rewş, bi têkilî ya pêrbestekê Nîr ên hevbend saz dikin.
wek: ser a ser, roj bi roj, der bi der,
rû bi rû, kurt a kurt.

d - Pêrbest ên hevbend

1 - Ji du xurdebêjan, yan ji pirsekê û xurdebêjekê pêrbest ên hevbend çêdibin.
wek jê - ra, lew - ra, şûn - de, pê - re.

ê - pêwend ên hevbend

1 - Pêwend ên hevbend, ji çend pewendan çê dibin. wek: da - ku, ji - bo ku, ji - ber ku.. Ev pirs ên jor; nav, rewş, pîşk, nîr pêrbest û pêwendin.

## Pirs ên dumil

28—Pirs ên dumil evin :

1 - Nav ên xurdezad

2 - Rewş ên xurdezad

3 - pîşk ên xurdezad

### 1 — Nav ên xurdezad

29—Nav ên xurdezad, li dû navan bi anin a xurdepaşkê çê dibin,

wek : kurd - istan, der - geh, kil - çiv

### 2 — Rewş ên xurdezad

30—Rewş ên xurdezad, bi anîn a xurdepaşkê li dû nav çêdibin.

wek : Bilûr - van, zîv - ker, bext - yar

### 3 — Pîşk ên xurdezad

31—Pîşk ên xurdezad, berî pîşk, bi anin a xurdepêşkê çê dibin

wek : ve - bûn hil - dan ra - xistin.

### 2 — Bi dîtin a rêz a wan

32—Pirs ên hevrêz - Pirs ên ku rêz û almanc a wan yekin, yan ji pir nêzîkî hevin, ji wan re **hevrêz** tê gotin.

wek dar = ço

kevir = ber, kuç

kur = law

mêr = peya

### 3 — Bi dîtin a deng ên wan

33—Pirs ên hevdeng - pirs ên ku dengê wan yekin le mane ya wan ne yekin, ji wan re **hevdeng** tê gotin.

wek: rêvî = heywanekî kûvî

rêvi = rêvî ên hundur zik

nav = nav ên tîştan: kevir, ga, keleş

nav = bêjin, newq. h. p.

### Pirs én guhêzok

34—Pirs èn **dûçik** a wan tê guhertin, ji wan re **guhêzok** tê gotin, û guhêzok 5 in. **Nav, zêder, rewş, bernav, pîşk.**

35—Guhertin a duçikê, ji bo naskirin a **Babet tebab** û **kese.**

## a) Babet[1] الكيفية

36—Di kurmancî de hin pirs **nêr** û hin jî **mê** tên jimartin. Ji vi awa ê mêrî û mêyî a pirsan re **babet** tê gotin.

37—Du babet nav hene: **nêrza, mêza,**

a) Nav èm mêran û heywan ên nêr gîş nèrza tên jimartin,

wek: remo, Bozo, ga, nêrî, hesp.

b) Nan ên jinan û heywan ên mè giş mèza tèn jimartin.

wek: Zinê, Gewrê, bizin, çèlek, mirîşk

38—Nav ên hin heywanan **nêrmone** ango hem **nêr** û hem **mêne**.

wek: gur, hirç, kew, ker

39—Ji bo naskirin û ji hev derxistin a van navan ji hev: pirs èn **nêr, mê, mak, dêl, man** di pèşî ya nav ên wan de tê gotin.

---

(1) Babet: kurmanc dibêjin, filan tişt ji çi babetiye, ango ji çi cinsiye, ji çi maliyė. ev babet qence, ev babet ne pake. h. p.

wek :

| Nav | Nêr | Mê |
|---|---|---|
| ker = | nêr ker | man ker |
| kew = | nêr kew | mè kew |
| gùr = | gur | dêl gur |
| ga = | ga | manga |

## b ) Tibab[1] الكمية

40—Tibab - yekbûn, yan pirbûn a meruv, tişt û heywan ên ku em di wan de dipeyivin dide zanîn.

41—Di Kurmancî de du tibab hene: **tek, kom**

a - Navekî tek, ew nave ku hew meruvekî tiştekî, yan heywanekî bi tenê dide xuya kirin, wek: yek meruv, yek hesp, yek dar

b - Navekî kom, ew nave ku ji yekî bêtîr meruv, heywan, tişt dide xuyakirin. wek : sê meruv, pênc hesp du dar

---

(1) Tebab li şûn a mıqdar tê gotin.
wek : min tibabek kew girtin.
ez tibabekî rê çûm, tibabek mal ê min heye. h. p.

## c ) Kes

42—Kes - meruv ê ku pîşk; bi têkilî û kirin a wî bi cî tê, jê re **kes** tê gotin.

wek : **min** got, **tu** çûyî, **wî** da.

min, tu, wî sê kesan pêş me dikin ku heryekî karek kiriye.

43—kes, çax, rist, her sê: pêkîn ên pîşkin. bê wan pîşk bê kêr û bê mane ye.

44—Pêşing - ji parçe û movik a pirsê a pêşîn re **pêşîng** tê gotin, ku ew parçe tu caran na ê guhertin,

wek : **kir** in **xist** in

kir û xist pêşingin.

45—Paşing - parçe yê pirsê ê ku tê guhertin jê re paşing tê gotin, ku ev parçe bi têkilî ya her sê hêvan ên pîşkê: kes, çax û rist tê guhertin.

wek : kir in xist in

**in, in** paşîng ên kir û xistin.

# Bir IV

## Nav الاسم

46—Nav, pirsek guhèzoke ku bi kêrî navkirin a meruvekì, heywanekì, tiştekî tê, wek: Remo, çiya, ga, bext,

Pirs a **Remo** naveke, çiko meruvekî bi nav dike,

Pirs a **çiya** naveke, şiko tiştekî bi nav dike.

Pirs a **ga** naveke, çiko heywanekî bi nav dike,

Pirs a **bext** naveke, çiko tıştekî nedîtber bi nav dike.

47—Nav ên **makderî**, pirs a ku bi kerî naskirin a bûn a pîşkekî tê, jê re nav ên makderî tê gotin,

wek: ken, rev, lez, lîz, girî...

48—Makder bi xue di pir deran de wek nawan tên jimartin.

wek: kirîn û firotin, kar ê bazirganatîe dî vê pevekê de her du pirs ên kirîn û firotîn wek du navan hatine gotin.

49—Bi homayî **du** babet nav hene :
nav ên **Bernas û nav** ên **celeb**

## Nav ên bernas اسم العلم

50—Nav ên bernas -meruvekî, tiştekê bi tenê bi nav dike, ku ew meruv, ew tişt, bi wî navî nas û xuyaye.
wek : Memo, kurdistan.
Memo, navekî **bernase**, çiko ev nav, nav ê meruvekî, yan, ê çend meruvane, ne ê hemî meruvane.
Kurdistan, navekî **bernase**, çiko ev nav nav ê **welatekî** bi tenê ye, ne nav ê hemî welatane.

51—Tîp a ser ê nav ên **bernas** bi tîpên girnivîs tên nivîsandin.

52—Nav ên **beřnas** evin :

a - Yan nav ên **rastenavin**. wek : Memo, Cano, Bozo. Kurdistan, Gewrê...

b - Yan nav ên **malbatî** ne. wek :-Bedirxanî, Osmanî, Pehlewî...

c - Yan nav ên **nejadîne** wek : Kurd, Faris, Ereb.

e - Yan nav ên coxrafine : wek : Kurdistan, Hindistan, Çîn, Misir, Sûrîye...

## nav ên celeb اسم الجنس

53—Nav ên celeb, ew navin ku, her meruv her teba, her tişt ê ku ji yek celebîne, ji yek bêşîne pê bi nav dibin.

wek : meruv, çiya, pez

Meruv, navekî celebe, çiku hemî meruv bi vî navî, bi nav dibin. yanî celebekî pêş me dike.

Nav ê çiya, navekî celebe, çiko hemî çiyan bi nav dike.

Nav ê pez, navekî **celebe**, çiko hemî pežan bi nav dike.

54—Nav ê celeb, bi dû biran par ve dibe.

Şênber مادي razber معنوي

a ) Nav ê **şênber** - navekî şêne, dîtbere, ango heyînek berçav bi nav dike.

Wek : çiya, pez

çiya û pez du tişt ên berçavin, hene, her gav em karin bibînin.

b ) Nav ê **razber** - nav ê tiştekî neditbere. ango tiştekî bê can û laş bi nav dike, wek : giyan, bext, heş.

Tiştekî berçav, berdest bi nav ê giyan· bext û heş em ne karin bibînin. le di peyv û gotinê de em her gav li wan rast tên, û wek tişt ên berçav em wan nas dikin.

55—Nav ê celeb, bi nav ê **bêş** û **komzîk** bi du bir ên din par ve dibin.

56—Nav ê bêş - her çî tişt ên ku ji celebekî, ji bêşekîne, bi nav dike. wek: meruv, mîh, çiya.

Meruv, mîh, çiya, sê nav ên ji sê

cej ebanin, her yek ji wan celebekî bi nav dike, lew ra ev her sê nav ên han, nav ên bêşin.

57—Nav ê **Komzîk** -bi kêr î navkirin a komek meruv, tişt, heywan tê.

Wek : lek, kerî, ref, naxir..

Lek, Komek meruv.

Kerî, Komek pez

Ref, Komek teyr

Naxîr, Komek dewar bi nav dikin lewra ev nav ên han nav ên komzîkin.

58—Nav ê celeb- bi awa yê pêç a xue ji, bi sê biran par ve dibe.

nav ê lûs, alav, dumil.

## 1 — Nav ê lûs اسم الكان

59—Nav ê lûs - cikî, derekê, warekî bi nav dike.

wek : xanî, meydan, dibistan

Nav ê xanî, naveki lûsiye. ciko lûsekê cikî bi nav dike. Meydan û dibistan ji bi vî rengî her yek cîkî bi nav dikin, ji lew ra ev nav ên han nav ên lûsin.

60—Nav ên lûs jî bi du biran par ve dibin, lûs a xuber, lûs a sazber.

61—Lûs a xuber - ew nav ê celebe ku cîkî, derekê bi nav dike : xanî, seray, meydan. Nav ên xanî, seray, meydan, nav ên celebin û her yek ji wan lûsekê bi nav dikin

62—Nav ê lûs ê sazber - ji nav û pirsne din, bi alîkarî ya xurdepaşan nav ên lûs tên sazkirin. Ku ew nav ên han jî bi kêrî binavkirin a cî û deran tên.

63—Xurdepaş ên ku nav ên lûs saz dikin evin : stan, geh, zar, xane.

a) stan - bi homayî, nav ên coxrafî bi alîkarî ya xurdepaş a stan tê çêkirin

| | | |
|---|---|---|
| wek : | ji Kurd | Kurdistan |
| | » Efxan | Efxanistan |
| | » Hind | Hindistan |

b) ji nav ên coxrafî pêve hin nav ên lûs ên dîn pê saz dibin.

| | | |
|---|---|---|
| wek : | ji Gûl | Gulistan |
| | » Mûr | Mûristan |
| | » Gor | Goristan h. p. |

c) **Geh** - Bi kêr î sazkirin a nav ên lûs ên ne coxrafî, tê

wek: ji der    dergeh

ji mêr    mêrgeh

ji lîz    lîzgeh

ji çêre    çêregeh

d) **zar**: ji çîmen    çîmenzar

ji gul    gulzar

e) **lîn** - di hin pirsan de xurdepaş a **lîn** tê dîtin ku bi alîkarî ya wê nav ê lûs saz bûye, le pir hindike û ne ji bo ser û bere; dibe ku carnan ji neçarî meruv hewce yê wê ji bibe.

pirs ên ku lin tê de ne evin:

xuê    xuêlîn

birq    birqlîn

kun    kunlîn = ( kulîn )

hêk    hêklîn = ( hélîn )

f) **xane** - ev pirs ji bi hevaltî ya navne dî, nav ê lûs saz dike

wek: mêvan    mêvanxane

xeste    xestexane

64—Nav ên zivîstan, zêstan û dûstan nav ên xurûne, ne nav ên lûsin. Pirs ên xueserin. ne sazberin.

## 2 — Nav ê alav اسم الآلة

65—Nav ê alav, ew nave ku bi kêrî binavkirin a alavekî tê.
wek: kêr, şûr, qelem..

66—Nav ên alav ji du birin: **xueber, sazber**

a - En **xueber** - nav ên ku ji xueber, nav ên alavanin. wek: kêr, şûr, qelem..

b - Ên **sazber** - ên ku bi alikari ya xurdepaşan ji navan û rewşan tên sazkirın.

67—xurdepaş ên ku nav ên alav pê saz dibin evin: **ek**, **dan**. çîv, ing

a - ek - ji pîşkan bi alîkarî ya **ek** nav ê **alav** saz dibe.

| | | |
|---|---|---|
| wek: | ji birîn | birek |
| | » badan | badek |
| | » pêçan | pêçek |

b - **dan** - Nav ên alav, ên ku bi kêr î kalan ê tişlekî tê pê saz dibe. wek:

ji çay çay**dan**
» xuê xuê**dan**
» kevçî kevçî**dan**
» derzî derzî**dan**
» kil kil**dan** h.p..

c - çîv - di yck navî de tê dîtin. Ez jê bêtir lê rast ne hatim; ne dûre ku hîn pêde bibe; eve ;

ji kil kil**çîv**

d - ing - ev xurdepaş li pê hin navan tê û nav ên ku gerekin em karin pê saz bikin wek :

ji bêjtin bêj**ing**
» hevirandin hev**ring**

Birînk - bi **ing**, navne din ku ne **alavîn** saz dibin

wek . ji zivistan ziving = ( şikefet )
» roj rojing = ( pace )
» ar aring(gurîbûnek pez)
» sar saring = ( ku bûye sahrînc )

ev nav ên han ji nav ên **xurdezad** tên jimartin.

## 3 — Nav ê dumil الاسم المركب

68—Nav ê dumil, bi du awa çê dibin : hevbend, xurdezad.

a - Hevbend - bi pênc awa saz dibe :

du nav : mar - masî, ker - guh, sîr - dim bira - mak, bira - bav h.p.

b - Nav û **rewş** : pez - **kûvî**, gir - **sor**. jar - mar

c - Nav û pîşk : ger - av

d - Nav û nîr : ber - çavk. ber - malî, nav - malî

e - Nav û pêrbest : bin - dest, ser - dest

69—Nav ê xurdezad - ji van her pênc awan pêve bi alîkarî ya xurdebêjan nav ên **dumil** saz dibin .

70—xurdebêj ên ku nav ên xurdezad çê dikin evin : **gûn**, **n**, **tî**.

| | | | |
|---|---|---|---|
| a - gûn - | ji | ar | ar**gûn** |
| | ji | par | par**gûn** |
| b - n. | ji | xew | xew**n** |
| | » | tev | tev**n** |
| c - ti | » | bira | bira**tî**, gun**dî**, gun**dîtî**. |

## 4 — Nav ên piçûkker اسم التصغير

71—Nav ên piçûkker, bi kêrî piçûkkirin a navekî tên:

72—ji bo çêkirin a nav ê piçûkker li pê navan xurdepaş a **k** û **lk** tê.

wek : bira biral**k**

dar dar**lk**

73—Hin nav bi alîkariya (**çe**) çêdibin.

wek: ji bax bax**çe**

» par par**çe**

» keman keman**çe**.

## Di navan de babet

74—Di kurmancî de **du babet** hene : nêrza, mêza.

75—Bi awa yê razdarî ji bab e bi du biran parve dibe : rasteza, gûmanza.

a ) Rasteza - ji wan navan re rasteza tê gotin ku bi rastî yan **nêr** û yan **mê** ne. wek : **ga, çêlek, mêr, jin**.

b ) Gûmanza - ji wan navan re gûmanza tê gotin bi rastî ne **nêr** û ne **mêne** le di zimên de wek rastezayan hin nêr û hin mê hatine pejirandin.

ji bo nav ên weha di Kurmancî de tu rêzan ên durust pêde nabin, bi bihîstinê meruv hîn dibe.

76— v tişt ên jêr, nêr û mêyên wan bi vî awayî ji hev tê gerandin :

**a — Ên nêr**

a - Libat' ên laş ê meruv ên der :
Poz. **Serî: çav, birû, bijang, dest, çeng ling, poz, diran, ziman, simêl, çıf, zik (enî, sîng, inîşk, lêv, tilî, pêçî, rî, çîp,)** ji vê rêzê derin, mêzane..

b - **Erd, cî, war, çiya, gir, gelî, şewl** ( newal ) ji vê rêzê dere, mêzaye.

c - Dar ên hişk û birî : **dar, ço, beşt, tîr,** ( şiv ) ji vê rêzê dere, mêzaye.

d - çem

e - Ezman.

f - çek ên li xuekirinê : kiras, derpê, şal...

**2 — Ên mê**

a - Libat ên laş ên me ên hundur :
kezeb, gurçik, rêvî, reh...

(dil û hûr) ji vê rêzê derin, ~~mêzane~~ nêr.

b - Dar ên ter û li dar.

c - Av, berf, baran, qeşa, zîpik

d - Roj, hêv, sitêr.

e - Cil, tej, ber, mehfûr, xalîçe, tevn

f - Firax ên xuarinê: tas, sêni, beraş..

g - Nav ên makderî kirîn, firotin, rev, lez.

(Ken, girî) ji vê rêzê derin, ~~mêzane~~ nêr..

# Bir V

## **Verês( * )** اماله

77—Di hin nîran de nav ên nêr ku ( **a** ) di wan de hebin bi ( **ê** ) tène guhestin. Èn mê eger ( **a** ) hebe jî ( a ) wek xue dimîne le ( ê ) yek zêde tê dawî ya wan nawan, ku ji vî awayî re **verês** te gotin.

Rêzan - Nav ên nêrza ku **pîşkar**(1) bin di **buhêrkê** de(2) ( **a** ) bi ( **ê** ) tê guhestin û di **nuhok**(3) û **mandê**(4) de wek xue dimîne.

wek : Osman, ga, aş sê nav ên nêrzane Di buhêrkê de ku pîşkarbin, dibin: Osmên gê êş

| | | |
|---|---|---|
| wek : | Osmên | sêv xuar |
| | gê | ka xuar |
| | êş | ard hêra |

---

( * ) Verêstın zivîrandinek hindik

(1) Pîşkar فاعل (2) Buhèrk ماضي (3) Nuhok حال

(4) mand مستقبل

di çax ên din de ( a ) wek xue dimîne, wek :

a {
osm**a**n sêvê dixue
g**a** kaê dixue
aş êrd dihêre

b {
osm**a**n ê sêvê bixue
g**a** ê kaê bixue
aş ê êrd bihêre.

I - Nav ên nêrza ku pîşkber ên durust(1) bin di buhêrekê de nayên guhestin, le di nuhok û mandê de tên guhestin.

a - Di buhêrkê de: nayên guhestin.

wek : Soro **xalid** xist
Qenco **ga** kuşt
Kurik **nan** xuar

b - Di nuhokê de: tên guhestin:

wek : Soro **xêlid** dixe
Qenco **gê** dikuje
Kurik **nén** dixue

c - Di mandê de tên guhestin :

wek : Soro ê **xêlid** bixe

---

(1) Pîşkber ê durust مفعول صريح

Qenco ê **gê** bikuje

Kurik ê **nên** bixue.

II - Nav ên nèrza eger pîşkber ê nedurustbin(1) di hemî çax û nîran de (a) tê guhestin.

a - Di buhêrkê de :

Sero li **xêlid** xîst

Qenco ji **osmên** re got

Osman ji **êş** çû

b - Di nuhokê de :

Soro li **xêlid** dixe

Qenco ji **Osmên** re dibèje

Osman ji **êş** diçe

c - Di mandê de :

Soro ê li **xêlîd** xe

Qenco ê ji **osmên** re bibêje

Osman ê ji **êş** biçe

III - Nav ên mêza ku pîşkarbin :

Di buhêrkê de (**ê**) tê dawî ya wan û di nuhok û mandê de wek xue dimînin:

a - Di buhêrkê de :

---

(2) **Pîşkber ê nedurust** مفعول غير صريح

**keçikê** sêv xuar
**çêlekê** kurik xist
**Siltanê** berx anî
b - Di nuhokê de :
**keçik** sêvê dixue
**çêlek** kurik dixe
**Siltan** berx tîne.
c - Di mandê de
**keçik** ê sêvê bixue
**çêlek** ê kûrik bixe
**Siltan** ê berx bîne

IV – Nav ên mêza ku pîşkber ê durust bin
a - Di buhêrkê de tiştek lê zêde nabe.
wek : Remo **çêlek** bir
Cano **bizin** anî
b - Di nuhok û mandê de (ê) li dû wan tê
wek : Remo **çêlekê** dibe
Cano **bizinê** tîne

V - Gav a pîşkber ê nedurust bin her gav (ê) tê dawî ya wan :
a - Di buhêrkê de :
Remo **li çêlekê** da
Cano **ji bizinê re** tîne.

2 - Nav ên makderî ku hemî meza têne jimartin herçî awa ên nav ên mêza li wan tê ·

wek: Remo **kirîn** kir

Remo **kirînê** dike.

**Di navan de kom**

78—Di Kurmancî de ji **yekê** berjor **kome;** û li dû navan bi anîn a **an**, çê dibe, wek :

| | |
|---|---|
| kur | kuran |
| mêr | mêran |
| hesp | hespan |
| rez | rezan |

79—Le ev rêzan, ne rêzanek paydare ew jî bi babet ê pîşk û celeb ê kar ê navve girêdayîye.

a - Eger nav, **pîşkarekî bi pîşkber** be di buhêrkê de ( an ) distîne û diçax ên din de **şût** dimîne, wek :

mêr**an** kevir birîn

rêncber**an** cot kirin

b - Eger nav pîşkarekî bê **pîşkber** be d her nîrî de **şût** dimîne wek:

mêr çûn, mêr diçin

rêncber hatin, rêncber têن

c - Eger pîşkber ê durust be di buhêrkê de şût dimîne, le di nuhok û mandê de **an** distîne. wek: kevır — dar

mêran **kevir** birîn

mêr kevir**an** dibirin

Rêncberan **dar** birîn

Rêncber dar**an** dibirin

weku xuyaye pîşk her gav (n) a kombûnê distîne. Gava ku nav di nîrekî de şût dimîne komîya wi ji komî ya pîşk xuya dîke.

d - Eger pişkberekî ne durust be her gav ( an ) distîne wek:

mêran ji kevir**an** birîn

mêr ji kevir**an** dibirin.

a - **Herçî nav ên ku dûtîp a wan dengdarek be di komê de ( yan ) distîne.**

wek : serî **serîyan**

bira **birayan**

b - Le nav ên ku dûtîp a wan ( a ) an (e) bin di komê de ( a ) û ( e ) hiltên û wek nav ên din ( an ) distînin.

wek : bira **biran**

pere **peran**

c - Pirs ên wek ( dê ), ( rê ) di komê de dibin : diyan riyan.

Le ji bo hêsanî û ne wendakirin a hîm ê pirsê gerek : **dêyan, rêyan** werin nivîsandin û ( **diyan**, **riyan** ) werin xuendin.

# Bir VI

## **Zêder** حرف تعريف

80—Zêder, pirsek piçûke, dikeve navber a **du** navan, yan navek û rewşekê ji bo ku wan bi hev bide gîrêdan û **babet** û **tibab** a wan bide zanîn.

81—**Du** bêş Zêder hene: **pendî**, **nependî**,

1° Zêder a pendî حرف تعريف معين

82—Zêder a pendî, ewe ku **babet** û **tibab** a nav rast a rast dide zanîn, evin:

**a** ji bo **mêyan**: keç **a** Memo

**ê** ji bo **nêr**an : kur **ê** Memo

**ên** ji bo **kom** a herduyan. keç û kur **ên** Memo

—Nîşane: Zêder, pirsek **xuesere**, cihê tê nivîsandin, ne cuda kirin a wê ji pirsê, xelete, ne raste.

Di zêder a pendide kêsim(1)

---

(1) Kêsim : الشكل

83—Di zêder a pendî de çend **kêsim** hene gerek meruv wan xueş zanibe:

a - Her du nav ên ku zêder wan digihêne hev, eger, ê pêşîyê têp a wî ya paşîn tîpek **dengdar** be (**y**) dikeve navber a her duyan.

wek: ka, ba, ga, mû,
dû, serî, derî

Dibin: ga—**y**—ê cot
ka—**y**—a ceh
mû-**y**—ê reş
serî-y—ê pez.

b) Nav ên wek **dê**, **rê** dibin:
(di, ri) wek:
di - y - a Bozo
ri - y -.a teze...

Le gerek dê - y - a Bozo, rê-y-a teze werin nivîsandin da ku pêç a pîrsê wenda nebe.

c) Eger nav ê paşîn navekî **nêrza** be û tîp a (**a**) tê de hebe dibe (**ê**) wek:

agîr. ba, ga,

dû - y - ê **ê**gir
deng ê **tê**
sim ê **gê**

d) Eger nav ê paşîn, navegî **méza** be li dû wî tîp a **ê** tê, wek: ka, gul. çêlek
Dibin: kadîn a ka**ê** yan kadîn a ka-y-**ê**
dar a gul**ê**
şîr ê çêlekê..

### Avêtin a zêderê

84—Avêtin a zêderê ji navber a du navan, yan navek û rewşekê yan jî ji navber a du rewşan du kêsim ên din dixîne dest ên me:

1 - Eger em zêderê ji navber a du navan, yan navek û rewşekê yan jî ji navber a du rewşan bavêjin, nav yan rewş a **dumil** saz dibe.

wek: guh ê ker dibe guh ker
masîyê mar » masîmar
gul a sor » gul sor
av a germ » av germ
mêr ê ciwan » mêr ciwan

II - Eger em cî yê van nav ên dumil biguherin navekî dumilî din saz dibe. wek:

| | | |
|---|---|---|
| guh-ker | dibe | kerguh |
| gul-sor | » | sorgul |
| masî-mar | » | marmasî |
| av-germ | » | germav |
| mêr-cîwan | » | cîwanmêr |

III - Eger em rewşan li vê rêzanê barkin, rewş ên **dumil** saz dibin. wek:

| | | |
|---|---|---|
| buha yê giran | dibe | buha - giran |
| buha - giran | » | giranbuha.. |

## 2 — Zêder a nependî حرف تعريف غير معين

85—Zêder a nependî, meruv, heywan û tişt ê ku em jê dipeyivin bi awakî **ne nas** pêş me dike.

Êger min got: mihîn a Memo, ji mihînan mihînek nas û xuya bi nav dikim.

Le ku min got, mihînek Memo, îcar ez bi awakî nenas, nependî ji **gelek** mihîn **yekê** bi nav dikim, ku ev celeb zêder **nependîye**.

86—Li dû navan bi anin a **ek**, **eke**, **ekê**, **ekî**; zêder a nependî saz dibe;

wek : hesp dibe: hespek, ango yek hesp

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| gul | » | gulek | » | yek gul |
| mêr | » | mêrek | » | yek mêr |

87—Di zêder a nependî de çend kêsim hene ku evin :

I - Eger nav, **pîşkarekî** bi pîşkber û nêrza be, di **buhêrkê** de **ekî** û dî nuhokê de **ek**; eger mêza be di **buhêrkê** de **ekê** û di **nuhokê** ide **ek** distîne wek :

| **çax** | **Nêrza** | **Mêza** |
|---|---|---|
| Buhêrk: | Kur**ekî** sêv xuar, | Keç**ekê** sêv xuar |
| Nuhok : | Kur**ek** sêvê dîxue, | Keç**ek** sêvê dixue |

II - Eger nav, **pîşkber ê durust** be, rast a rast vaj ê pîşkare. wek :

| | Nêrza | Mêza |
|---|---|---|
| Buhêrk : | Biro Kur**ek** xist | Biro keç**ek** xist |
| Nuhok : | Biro Kur**ekî** dixe | Biro keç**ekê** dixe |

III - **Eger pîşkber ê nedurust** be, ji **bo nêran** di her çaxê de **ekî**, ji **bo mêyan ekê** tê :

| **çax** | **Nêrza** | **Mêza** |
|---|---|---|
| Buhêrk : | Biro li kur**ekî** xist | Biro li keçe**kê** xist. |
| Nuhok : | Biro li kur**ekî** dixe | Biro li keçe**kê** dixe. |

IV - Eger **pîşkar** ê **bê pîşkber** be : ji bo her du babetan di her çaxê de **ek** tê wek :

| **çax** | **Nêrza** | **Mêza** |
|---|---|---|
| Buhêrk : | Kurek çû | Keçek çû |
| Nuhok : | Kurek diçe | Keçek diçe |

Di zêder a nependî de **kom**

88 – Di zêder a nependî de **kom**, li dû **her du babet** ên navan, bi anîn a **na** û **ne** çê dibe

a) Eger nav, **pîşkarekî nêrza** û **bi pîşkber** be di buhêrkê de **na** û di nuhokê de **ne** tê :

| **çax** | **Nêrza** | **Mêza** |
|---|---|---|
| Buhêrk : | Kur**na** sêv xuarin | Keç**na** sêv xuarin. |
| Nuhok : | Kur**ne** sêvê dixun | Keç**ne** sêvê dixun. |

b) Eger pîşkar ê bê pîşkber be, di her çaxê de **ne** tê wek:

| Çax | Nêrza | Mêza |
|---|---|---|
| Buhêrk: | Kur**ne** hatin | Keç**ne** hatin |
| Nuhok: | Kur**ne** tên | Keç**ne** tên |

c) Eger pîşkber ê durust be: vajî pîşkar di buhêrkê de **ne** û di nubekê de **na** tê wek:

| Çax | Nêrza | Mêza |
|---|---|---|
| Buhêrk: | Memo kur**ne** xistin | Memo keç**ne** xistin. |
| Nuhok: | Memo kur**na** dixe | Memo keç**na** dixe. |

d) Eger pîşkber ê ne durust be: di her çaxê de **na** tê. wek:

| Çax | Nêrza | Mêza |
|---|---|---|
| Buhêrk: | Memo li kur**na** xist | Memo li keç**na** xist. |
| Nuhok: | Memo li kur**na** dixe | Memo li keç**na** dixe. |

# Bir VII

## **Rewş** الصفة

80—Pirs a ku **hevalî** ya **nav** ji bo **salixdana**, kêsim û reng ê wan, dike jê re **rewş** tê gotin.

81—Şeş bêş rewş hene. Salixdan, jimar, nîşandan, arzî, pirsyar, nependî.

### 1 — Rewş a salixdan الصفة الوصفية

82—Rewş a salixdan hevalî ya navekî ji bo **salixdan** a reng û kêsim a wî ya **qenc** yan jist dike:

wek: baş, xueş, reş sor

83—Rewş ên wek baş, xueş, reş bi kêrî salixdan a reng, kêsim û weş a meruvekî tîştekî tên, çiku em karin bibêjin, meruv ê **baş**, baxçe yê **xueş**, gul a **sor**.

84—Hin rewş hene ku bi ser ê xue wek

navanin wek : xizan, belengaz, bextivar, ciwan, pîr, ixtiyar..

**2 — Rewş a dumil** الصفة المركبة

85—Ji van rewş ên jor' ên **xurû** البسيط pêve hin rewş hene ku bi çend awa tên saz kirin ku ji wan re **dumil** المركب tê gotin.

86 - Rewç ên dumil jî bi du biran parve dibin xurdezad مشتق hevbend مركب

**a — Rews ên xurdezad** الصفات المشتقة

87—Rewş ên xurdezad, ji navan û pîşkan bi alîkarî ya hin **xurdepaşan** saz dibin û li dû navan û pîşkan tên, xurdepaş ên ku rewş ên nuh, saz dikin evin :

**baz, kar, ker, van, gîn, yar, dar, anî, ane, î .**

a - baz, **kar, ker, van,** li dû kîjan navî werin, hinermendî, sazkarî ya wî navî didin xuya kirin wek :

| | | |
|---|---|---|
| baz : | ji can | canbaz |
| | ji tîr | tîrbaz |
| kar ; | ji cot | cotkar |
| | ji alî | alîkar |

| | | |
|---|---|---|
| ker : | ji zîv | zivker |
| | ji şûr | şûrker |
| van : | ji bilûr | bilûryan |
| | ji ga | gavan |
| | ji zurne | zurnevan |
| vani : | ji aş | aşvanî |
| | ji êzing | êzingvanî |
| | ji bajar | bajarvanî |

b - **gîn**, **yar**, **dar**; nav bi rengekî, kêsimekê didin xuya kirin.

| | | |
|---|---|---|
| gîn : | ji gul | gulgîn |
| | ji reng | rengîn |
| yar : | ji heş | heşyar |
| | ji bext | bextyar |
| dar : | ji ser | serdar |
| | ji bin | bindar |

c - **anî**, **ane** : nav bi têkildariyekê salix didin

| | | |
|---|---|---|
| anî : | ji mêr | mêranî |
| | ji pir | piranî |
| ane : | ji şah | şahane |
| | ji derwîş | derwîşane |

d - î : reh û kok a meruvekî, tiştekî, heywanekî salix dide· wek :

| | |
|---|---|
| jî bajar | bajarî |
| jî gund | gundî |
| jî Mardîn | Mardînî |
| jî Bedlîs | Bedlîsî |

e - Mend : ji hiner hinermend
» şîret şîretmend
» aqil aqilmend

f - **hev**, **nîv** : Ev her du pirs jî rewş ên xurdezad saz dikin; le vajî xurdepaşan tên ser ê pirsê.

**Hev** : di karekî de, di tiştekî de yekbûnekê dide xuya kirin, wek :

| | | |
|---|---|---|
| ji | al | **hev**al |
| » | rê | **hev**rê |
| » | kar | **hev**kar |

**Nîv** : netemamî ya navekî dide zanîn:

| | | |
|---|---|---|
| ji | ro | **nîv**ro |
| ji | sal | **nîv**sal |

88—Pirs ên **xuas**, **rût**, **got** li dû navan tên û rewş ên xurdezad çêdikin :

ji pê pêx**xuas**

» ser se**rût**

» ser ser**qot**

89—Ji pîşkan bi alîkarî ya xurdepaşan rewş ên xurdezad saz dibin:

ji xuastin xuaz**gîn**

» lez lez**gîn**

» kirîn kir**yar**

**Rewş a hevbend** الصفة المركبة

90—Rewş ên **hevbend** bi **çar** awa yên din saz dibin

I - Bi rakirin a **zêderê** ji navber a du **bendewaran** wek:

ji dil ê şad **dilşad**

ji çav ê reş **çavres**

ji bejn a zirav **pejnzirav**

II - Bi guherandin a cî yê her du **bendewaran** wek:

ji buha ê giran **giranbuha**

ji zar ê xueş **xueşzar**

III - Li dû navan bi anîn a nav ên **pîşkber** çê dibe.

wek : ji bav bavkuştî

» mil mil şikestî

» ser ser firî

IV - Li dû navan û rewşan bi anin a fermandarî çê dibe. wek:

ji deng dengbêj

» dil dilrevîn

» xueş xueşgo

» pir pirgo

**Payedarî ya rewşan** درجات الصفة

91—Li gor a rewşekê ji kêmanî û piranî ya rewşek din re **payedarî** tê gotin.

92—Ji rewş ên **sallxdan** re **sê pàye** hene **xurû** البسيط العادي **paypîv** الافضلية **bê payan** التالدية

**1 — Rewç a xurû**

93—Rewş a **xurû**, rast a rast rewşe.

wek : **nuh,** kevn, mezin, reş...

**2 — Rewş a paypîv** الصفة التفضيلية

94—Rewş a **paypîv**, ew rewşe ku paye ya rewşan pê tê pîvan: **pir, hindik.**

95—Rewş a paypîv, **sê** bêşîn: **bilind paye, hevser nizimpaye.**

a - Rewş a bilindpaye, ji rewşek **xurû** û xurdepaş a **tir** sazdibe.

wek: sor  sor**tir**

reş  reş**tir**

Ku min got: ev gul **sortire** ango gulek dî ji **sor** heye, le a kû ez nîşan didim ji wê bêtir sore. Ku ji vî awayî re **bilindpaye** tê gotin.

b - Rewş a hevser - di rengeki de, di kêsimekê de, di pergalekê de **wekhevî** ya **du** tiştan, du kesan didexuya kirin. Rewş a **hevser**, bi têkilî ya pirs ên ( **wek, mîna** ) saz dibe.

wek: Memo **wek** Ristem jîre.

c - Nizimpaye التقليل — Kêmbûn û nizimbûn a navekî dide xuya kirin û bi têkilî ya pirs ên ( **kêm, hindik** ) saz dibe.

wek: Memo kêm hinere

Ristim hindik jîre

### 3 — Rewş a bêpayan الصفة التأكيدية

96—Rewş a bê payan, rewşek **bilind** yan **pîr bilind** dide xuya kirin.

97—Rewş a bêpayan **du** bêşin: **xurû**, **raser**.

a - Bêpayan a xurû - sâlixdan a payeke bilind dide.

wek : Ev gul **pir** sore,
Ev baxçe **pir** xueşe

b - Bêpayan a **raser** - salixdan a payeke bilindtir dike.

Pirs ên ku bi kèrî vì awayî tèn evin :

**pir**, **hîn**, **ji**, **tir**.

wek : Ev gul ji gul a dî **hîn** sor**tire**
Ev bajar **hîn** mez**tire**
Ev baxçe **hîn** xueş**tire**

98—Bi homayî, payedarî ya rewşan bi xurdepaş a **tir** saz dibe û ev xurdepaş li dû rewşan tè.

| | | |
|---|---|---|
| wek | çê | çêtir |
| | pak | paktir |

Nîşank - a - Pirs a **mezin** di payedarîyê de **in** jê tê avêtin û dibe, **meztir**. Kes tu cara nabêje **mezintir**.

b - Pirs a **pir**, di payedarîyê de ji hîm ê xue de dikeve dibe; **bêtir** kes tu cara nabêje **pirtir**.

c - Di pirs a **kevnar** de (**ar**) şûn a ( **tir** ) girtîye, **kevnar** û **kevntir** wek hevin.

d - Pirs ên xevar **û** xure jî bi payedarî hatine salixdan, di xewar de (**ar**) û di xure de ( e ) bûne xurdepaş ên payedarîyê.

Ev her du pirs du **pîşkaran** bi payedarî salix didin.

**Rewş ên beyanî** الصفات البيانية

99—Rewş ên beyanî, bi kêrî **cudakirin** a navekî yan çend navan ji celeb ê wan tên.

Ku min got: **hesp**: xueş nayê naskirin ku **kîjane**. Le ku min bi tilî ya xue nîşan da û got:

ev hesp; wê çaxê baş tê zamîn ku **ji** hespan kîjane, ji ber vê, pirs ên wek [ **ev, ew, vî, wî, vê wê** ] re rewş ên beyanî tê gotin.

100— Rewş ên beyanî evin: rewş ên **jimarî, nîşandan, arzî, pirsyarî, nependî.**

## 1 — Rewş a jimarî الصفة العددية

101—Rewş a jimarî, bi kêrî **birkirin** a navan ji hev û celeb ê wan tê, ku **tibab** û paye ya wan ji me re beyan dike.

102—**Du** bêş rewş ên jimarî hene: **xurû**, **payedar**.

a - Jimar ên **xurû**, bi kêrî beyankirin a **çend** bûn a nav tên wek: **yek**, **du**, **sê**, **çar**, **pênc**.

b - jimar ên payedar, bi kêrî beyankirin a rêz û paye ya nav tên. wek: a yekî, a duduya, a sisya.

103—Jimar ên payedar bi sê biran parve dibin: jimar a parkir, jimar a komzîk jimar a piçjimar.

## 1 — Jîmar a parkir التوزيعي,

104—Jimar a parkir, bi kêrî parkirinê tê, û ev reng jimar zo zo çêdibe.

evin : yek yek, du du, sê sê, çarçar

wek : Zaro yek **yek** tên.

Sêvan çar **çar** bide...

## 2 — Jimar a komzîk العدد الاجمالي

105—Jimareke ku ji yekê berjor dide xuya kirin.

Ev reng jimar, li dû jimarê bi anîn a ( **ek** ) çê dibe wek:

ji şeş şeş**ek**,
» heft heft**ek**
» deh deh**ek**,

## 3 — Piçjimar

106—Piçjimar, her wekî ji nav ê wê xuyaye bi kêrî jimarlin a piç û perçe yên nav tê. Ev reng jimar li dû nav, bi anîn a **yek** çê dibe.

evin; **niv**, sê**yek**, çar**yek**, pênç**yek** ango ji sêyan yek, ji çaranyek...

## 1 — Jimar a xurû

107—Jimar a xurû, rast a rast **jimare**.

Ji jimarên xurû re **rastejimar** tê gotin.

Rastejimar evin:

a - Ji yekê heya dehan: yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heyşt, neh, deh.

b - Ji dehan heya **bistan** : yanz**deh** duwanz**deh**, sêz**deh** çar**deh**, panz**deh**, şanz**deh**, huf**deh**, hîj**deh**, noz**deh**. bîst.

c - Ji bîstî heya **sedî** : bîst, sî, çel, pêncî, şêst, heftê, heyştê, nod, **sed**

d - ji sedî heya hezarî: sed, **du** sed, **sê** sed **çar** sed, **pênç** sed, şeş sed, heft sed, heyşt sed, neh sed, hezar...

108—jimar a Kurmancî ji jor de berjêr tê. wek : çar**hezar** û pêne **sed** û çel û şeş. Pênc sed û şêşt û sê hezar û neh sed û heyştê û pênc, tê gotin.

2 — Rewş ên nişandan الصفة الاشارية

109—Rewş a **nîşandan**; bi kêrî pêşkirin a meruvekî, heywanekî, tiştekî tê.
Wek meruv bi tilî ya xue tiştekî pêşhevke :
**ev** hesp, **ew** meruv

110—Rewş ên nîşandan evin :
**ev** ji bo **nêr** û **mê** yên **diyar** ( الحاضر )
ev hesp, ew meruv
**ew** ji bo **nêr** û **mê** yên **nêdiyar** الغائب
**ew** hesp, ew meruv

**vî** ji bo**nêr** ên **dîyar**
vî hespî, vî meruvî
**vê** ji bo **mê** yên **dlyar**
vê mihînê, vê keçê
**wî** ji bo **nêr** ên **nedîyar**
wî hespî, wî meruvî
**wê** ji bo **mê** yên **nedîyar**
wê mihînê, wê keçê
**van** ji bo **kom** a her du **cêleban** ên, **diyar**
van hespan, van mihînan
**wan** ji bo **kom** a her du **celeban** ên **nediyar**
wan hespan, wan mîhînan.

111—Rewş ên nişandan **vî, vê, wî, wê**, kîjan navî nîşan bidin eger ew nav **nêr** be li dû wî têp a (î), eger mê be tîp a (ê) tê, wek :

**vî** hespî, **vê** mihînê
**wî** hespî, **wê** mihînê

112—Nîşandan a **şev, ro, sal, car** bi ( î ) çê dibe.

wek: îşev, îro, îsal, îcar, tê gotin.

113—ji bo nîşandan a çaxan; ji bo çax ên nuha (**vê**) û ji bo çax ên buhurî (**wê**) tê şuxulandin: yê salê, vê mêhê, vê çaxê wê salê, wê mehê, wê çaxê tê gotin·

3 — Rewş ên arzî(1) الصفة الحكية

114—Rewş a arzî, ewe ku bi kêrî nîşandan a arzîdarî ya meruvekî, tişlekî tê. wek: hesp ê **min**, hesp ê **te**

114—Rewş ên arzî evin:

ji bo **nêran**: **ê** min, **ê** te, **ê** wî (wê) **ê** me, **ê** we, **ê** wan

ji bo **mêyan**: **a** min, **a** te, **a** wî, (wê) **a** me, **a** we, **a** wan.

## xue

115—**xue**, rewşek arzî ye, çîku ez karim bibêjim min hesp ê **xue** firot min mihîn a **xue** da

2 6—ji bo nêran: **ê** xue, **ên** xue
» » mêyan: **a** xue, **ên** xue

---

(1) **Arzî** = ملك. Di nav malê meruvekî de hinek malê yeki din hebe, jê re **arzî** ê filano dibêjin.

4 — Rewş a pirsyarî الصفة الاستفهامية

117—Rewş a pirsyar, bi kêrî naskirin a wî meruvî, yan wî tiştî tê ku di peyvê deye. wek : **çend**, hesp hene?

Rewş ên pirsyarî evin :

**çend, çi, çawa.**

**çend** - rewş a çend bi kêrî pirsyarî ya tibab ê tiştan, meruvan û heywanan tê. wek: çend meruv? çend hesp? çend sêv?

**çi** - bi kêrî pirsyarî ya tişt ên bê can tê. wek: çi dare, çi kevire?
carna çi kese? çi meruve? jî tê gotin. Le ev bi awaki **xore** (تحقير) ango wî ji tiştan dijmêre.

**çawa** - Pirsek dumile, ji rewş a **çi** û pirs a **awa** pev ketîye, le bûye rewşek pirsyarî.

Bi kêrî pirsyarî ya reng û awa yên meruvan û tiştan tê.
wek : çawa meruve, çawa tişte.

5 — Rewş a nependî الصفة المبهمة

118—Rewş ên nependî, bi awakî ne xuya, veşirtî meruvekî, heywanekî, tişteki pêş me dike,

Rewş ên nependî evin. her, hemî, kes, tu, pir, tenê, herkes, tu kes, hemî kes,.

# Bir VIII

## **Bernav** الضمير

119—Bernav, pirsek guhêzoke ku şûn a nav digre, li şûn a ku ez bibêjim. **Memo cot kir,** ez dikarin bibêjim: **wî cot kir** Pirs a **wî** bernaveke, çiku cî û şûn a nav girtiye.

120—Rewş û bernav pir caran wek hev tên xuya kirin, ji bo ku meruv wan tevlihev neke bi vî awayê jêr, ji hev kare bigerîne

1 - **Rewş**, hevalî ya nav dike. ji bo salixdan a reng û nîşan ên nav her gav bi nav re tê.

wek : **ev** meruv **ew** dar

2 - Le **bernav**, bervajî şûn a nav digre. Ew karê ku nav di **pevekê** de dike, bernav bê kêmanî, bi temamî dike.

wek : **Remo** xuar **wî** xuar

**Remo** dar şikand **wî** dar şikand

121—Pir pirs hene ku hem rewşin û hem

bernavîn. Wek: **çend, çi, hemî, tu, her.** Ev pirs ên han **rewşin** ku hevali ya nav bikin ango salixdan a kêsim û nîşan ên nav bidin; wek **hemî** meruv, tu tişt.

**Bernavin**, ku şûn a nav bigrin.

wek: **hemî** çûn **tu** ne hatin

122—Bernav, bî şeş bêşan parve dibin:

**Kesok, nîşandan, arzî, pevgih, pirsyar, nependî.**

1 — Bernav ên keşok الضمير الشخصي

123—Bernav ên kesok - Ew bernav ên ku kesan pêş me dikin, yan ji rast a rast şûn a nav ên kesan digrin, ji wan re **bernav ên kesok** tê gotin.

124 —**Sê** bernav **tek** û **sê** bernav **komîn** :

Evin: kes ê ku dipeyive, jêre **peyvok**

kes ê ku guhdare, jêre **diyar**

kes ê ku nehazire, jê re **nediyar** tê gotin.

Bernav ên kesok ên tek : **ez, min, tu, te ew, wî**

Bernav ên kesok ên kom: **em, me hûn we ew, wan**

124—Di Kurmancî de **sê bêş** bernav ên kesok hene: Serkar, salt, dûmdar.

a - Bernav ên serkar evin :

| | **kes** 1 | **kes** 2 | **kes** 3 |
|---|---|---|---|
| kes ên tek | : mîn | te | wî |
| kes ên kom | : me | we | wan |

b - Bernav ên salt evin :

| | **kes** 1 | **kes** 2 | **kes** 3 |
|---|---|---|---|
| kes ên tek : | ez | tu | ew |
| kes ên kom : | em | hûm | ew |

c - Bernav ên dûmdar, bi ser ê xue bi kêr nayên, bi dûçik a bernavan û pîşkanve tên girêdan evin :

| | **kes** 1 | **kes** 2 | **kes** 3 |
|---|---|---|---|
| tek : | m | î | e |
| kom : | n | n | n |

125—Ev her sê celeb kesok, di pevekê de, her yek cîkî wanî cihê heye :

a - Kesok ê serkar- di pîşk ên **derhingêv** de, di buhêrkê de **pîşkare.**

wek : **min** cot kir, **te** cot kir **wî** cot kir

Di nuhokê de **pîşkber ê duruste** :

wek : Memo **mîn** dibe Memo **te** dibe,

Memo **wî** dibe.

Di **her çaxê** de pîşkber ê neduruste.

b - Kesok ên salt - Di pîşk ên **derhingêv** de, di **buhêrkê** de pîşkber ên dnrustin wek: Memo **ez** birim Memo **tu** birî Memo **ew** bir

Di nuhokê de pîşkarin :

wek : **Ez** Memo dibim **Tu** Memo dibî **Ew** Memo dibe

Di pêşk ên **saltgîr** de فعل لازم di her çaxê de pîşkarin.

wek : **ez** çûm **tu** çûyî **ew** çû

**ez** diçim **tu** diçî **ew** diçe

c - Kesok ên dumdar - her gav wek xurdepaşan li dû bernawan û pîşkan tên Bi ser ê xue bê manane.

wek : ez dîçi**m** tu diç**î** ew diç**e**

em diçi**n** hûn diçi**n** ew diçin

Çawa ku li dû pîşkan tên wesa jî li dû bernavan tên.

wek : ez**im** tu**î** ew **e**

em**in** hûn**in** ew**in**

Babet ên bernavan الكيفية في الضمائر

126 – Bernav bi homayî bê hêlin ango bê babetin, hew ji wan kesok ê sisya xudan **babete**.

evin : ji bo nêrza : **wî**
ji bo mêza : **wê** ye.

Bernav ên bêhêl

127 — Bernav ên kesok, her gav yan **pîşkar**, yan jî **pîşkbêrin**. Herçî bernav ên **bêhêl** her gav pîşkbêrin.

128 — Bernav ên **bêhêl** evin : **ê, hev, xue.**

**1 — ê**

129 — (**ê**) Bernavek **bêhêle**, li dû pêşkan tê, şûn a **wî**, **wê**, digre·

Li şûn a ku ez bibêjim; min da **wî** yan min da **wê**, dikarim bibêjim min da **ê**

130 — Bernav a bêhêl ( ê ) şûn a bernavek kom nagre, ango nakeve şûn a bernava **wan.**

**131** — (ê) bi [ li, bi, di, ji ] re dibe yek û dikeve vî kirasî : **lê, pê, tê, jê.**

lê = li wî, yan li wê

**pê** = bi wì yan bi wè

**tê** = dî wî yan di wê

**jê** = ji wi yan ji wê

132—(ê) - şûn a pîşkber ê nedurust digre.

wek: Min ga firot Memo, dikarin bibêjin

Min ga firot wî, û dikarin bibèjim

Min ga firot **ê**

Di vê pevekê de **wî** şûn a **Memo** û (ê) şûn a **wî** girtîye.

2 — **hev**

132—Hev - Bernavek bèhèle, her gav pîşkber ê neduruste.

wek: zaro li hev didin.

me li hev xist

134—Hev - Bi [ bi, di ] re tê pêçan û dibe:

**pev** = tev

**pev** = bi hev

**tev** = di hev

3 — **xue**

135—xue - Bernavek **bêhêle**, jê re bernav a **rajêr** jî tê gotin.

wek: Min da bîra yê **xue**

Min ji kur è **xue** re got.

136—Eger di pevekê de pîşkar û pîşkber yek kes bin (xue) dikeve şûn a pîşkber.
wek: min xue şûşt
ji bo ku **min min** şûşt neyê gotin pirs a ( **xue** ) dikeve şîn a bernav a duduyan.

2—Bernav ên nîşandan والضمير الصفة الاشارية

137—Bernav ên nîşandan, şûn a navekî bi awakî nîşankerî digrin.
Wek: **ev** çû **ew** direve..

138—Bernav ên nîşandan bi berçavî **du** birin: dîyar, ne dîyar:
Bi awayê babetê ji **du** birin; nêrza, mêza evin:

| | **dîyar** | **nedîyar** |
|---|---|---|
| Nêrza yên tek: | ev, vî | ew, wî |
| Mêza yên tek | ev, vê | ew, wê |
| Kom a herduyan: | van | wan |

129—**vî, vê, wî, wê,** di pîşk ên derhingêv, فعل متعدي di buhêrkê de şûn a pîşkar digrin:
wek: Vî (vê) dar xist
Wî (wê) dar xist

Di buherkê de şûn a pîşkber ê nê-durust digrin

wek : Memo li vî ( vê ) xist

Memo li wî ( wê ) xist.

Di nuhokê de şûn a pîşkber ê durust û nedurust digrin.

wek : Memo vî (vê) dixe pr. durust

Memo li vî (vê) dixe pr. nedurust

140— **ev**, **ew** - Di buhêrkê de pîşkber ê du-rustin .

wek: Memo ev (ew) xist.

141—Di pîşk ên **saltgîr** فعل لازم de, di her çaxê de pîşkarin wek : ev çû, ew çû

ev diçe, ew diçe

142—Kom a her du babetan **van** û **wan** di pişk ên derhingêv de di buhêrkê de hew karin şûn a pîşkar bigrin. wek:

Van dar xist

Wan dar xist.

3 — Bernav ên arzî الضمير الصفة الملكية

183— Bernav ên arzî şûn a navekî xuedî tîşt digrin.

144—Bernav ên arzî evin:

| **Nêrza** | **Mêza** | **koma a her duyan** |
|---|---|---|
| ê min | a min | ên min |
| ê te | a te | ên te |
| ê wî (wê) | a wî (wê) | ên wî (wê) |
| ê me | a me | ên me |
| ê we | a we | ên we |
| ê wan | a wan | ên wan. |

4 — Bernav ê pêgih الضمير الموصول

145—Bernav ê pêgih, havil a ku di **pevekê** de xuya dike bi nav ê pêşî ya xue ve girêdide.

146—Bernav ên pêgih evin:

| **nêrza** | **mêza** | **kom a herduyan** |
|---|---|---|
| ê ku | a ku | ên ku |
| wek: ê ku hat | a ku hat | ên ku tên |

Memo **ê ku** cot kir, Nigar **a ku** tevnê dike

147—Bernav ê pêgih her gav pîşkare.

wek: ê ku cot kir, ê ku cot dike

148—Eger bibe pîşkher pirs a hatîn di dû re te. wek: ê ku hat xistin

ê ku tê xistin

## 5 — Bernav ê pirsyarî ضمير الاستفهام

149—Bernav ê pirsyarî, şûn a nav bi rengekî pirsyarî digre, wek: Kîye? kîjane? çiye? kî, kîjan, çi, bernav ên pirsyarine.

150—Kê? kî? di pevekê de kê? û kî? cihê cihê cî digrin. Zanîn a cî yên wan di kurmancî de pir gereke.

a - **kê**?-Di pîşk ên derhingêv de, di buhêrkê de pîşkare wek: **kê** Memo xîst,

Di nuhokê de dibe pîşkber, wek: Memo **kê** dixe?

Di her çaxê de dibe pîşkber ê nedurust, wek

Memo li **kê** xist? Memo ji **kê** dixe?.

b - **kî** ? - Di pîşk ên derhingêv de, di **buhêrkê** de dibe pîşkber ê durust.

wek: Memo **kî** xist?

Di **nuhokê** de bervajî dibe pîşkar, wek:

**kî** Memo dixe?

Di pîşk ên **saltgîr** de, di her çaxê de pîşkare wek: **kî** çû? **kî** diçe?

**Kîjan**? - ji [ kî, ji, van (wan) ] hatine

pevxistin, bi kêrî pirsyarî ya meruvan û heywanan tê.

wek : kîjan çû ? kîjan dixue?

çi ? - şûn a nav ên bê giyan digre - wek:

çi ket? çi şewiti ? çi wenda bû?
dar ket! dar şewiti! qelen wenda bû!

6 — Bernav ê nependî الضمير المبهم

151—Bernav ê nependî, şûn a nav bi awakî nependî digre.

wek : her kes meruve !
kesek vê nezane !

pirs 'ên her, kes, kesek, tu, hinek, her yek, meruv, bernav ên nependine.

# Bir IX

## **Pîşk**(1) فشل

152—Pîşk - Pîrsek gu êzoke, ku bi kêrî rêdan a karekî, havilekê, bûnekê tê.

wek : Memo Cano **xist**.

Pirs a **xist** pîşkeke, çiku bunekê pêş me dike.

## **Pîşkar**(2) فاعل

153—Pîşk; hîm ê pevekêye, bê pîşk pevek saz nabe nemaze di **dûzan** û çax ên newek hev de, awa yê bûn a kirinekê nîşan dide. Ev bûn û kirin **llim** bi dest ê

(1) Fîşk — kuştinek, diziyek, karek diqewime û ê ku kirîye nase, dibêjin ev pîşk a filano ye, û carna jî ev fêl ê filano ye dibêjin. Pirs a pîşk û fêl di manakê de tên. **Finês** jî hêye le ji pîşk ên pîs wek dizî û kar ên ne li rê re tê gotin.

(2) Pişkar - Ew kes ê ku pîşk jê çêdibe, jê re pîşka dibêjin : « filan pîşkar ê filan tiştî bû».

meruvekî, yan bi têkilî ya lişlekî der çê dibe ku ji vî meruv, yan ji vî lişlî re **pîşkar** te golin.

Pişk ên derhingêv(1) فعل متعدي û saltgir(2) فعل لازم

154—Pîşk bi hebûn û nebûn a pîşkber(3) bi du biran parve dibin: derhingêv متعدي û saltgir لازم

a — Pîşk a derhingêv فعل متعدي

155—Pişk a derhingêv, bi hebûn a pîşkberekî durust مفعول صريح lê naskirin, wek: kirîn xistin, du pîşk ên derhingêvin çiku, Memo **sol** kirî, Nigarê **tas** xist tê golin, **sol** û **tas** du pişkber ên durustin, ji bervê, **kirin** û **xistin** du pîşk ên derhingêvin.

---

(1) Derhingêv — Ew kar ê ku tiştekî der di hingêve.

(2) Saltgîr: Salt bi tenê, bi ser ê xue, saltgîr, ew kar ê ku bi yekî salt çê dibe.

(3) Pîşkber: ê ku li ber pîşke wek rencher, êku li ber rencê, emirber ê ku li ber emre.

156—Pîşk ên derhingêv, her gav bi pîşkberin,

b — Pîşk a Saltgir لازم فعل

157—Pîşk a saltgîr, bi nebûn a pîşkberekî durust tê naskirin. wek : ketin, hatin, du pîşk ên saltgîrin, çiku Memo ket, Nîgarê hat; tê gotin.
Di van her du pevekan de tê dîtin ku meruvekî dî yan tîştekî din pîşkber tune ye, hew, ê ku ket, ê ku hat Memo û Nîgarin, ji ber vê **ketin** û **hatin** du pîşk ên saltgîrin.

Pîşk ên dîdarمعلوم, nedîdarمجهول, kesokشخصی

158—Bi sê awa yên din meruv li pîşkan rast tê. **Dîdar**, **nedîdar**, **kesok**

a- Pîşk ên dîdar معلوم- Ew pîşkin ku pîşkber ne wendaye, wek : Memo **sol** kirî, Nîgarê **tas** xist.

b - Pîşk ên nedidar مجهول - Ew pîşkin ku pîşkber ê wan wendane, wek · hat kirîn hat xistin.
Pîşk a nedîdar bi alîkarî ya pîşk a **hatin** saz dibe ji ber vê ji pîşk a **hatin** re **nedîdarkar** tê gotin.

159—Ji bo çêkirin a pîşk ên nedidar, pîşk a **hatin** berî pîşk a kesok tê û nedîdar pê saz dibe.

wek : ji kîrîn: **hat** kirîn, **tê** kirîn

3 — Pîşk ên kesok اسماء الشخصي

160—Pîşk ên kesok: ew pîşkin ku bi hevkarî ya du bernav ên kesok pêk tên, wek : Min **xue** avêt.

161—Ji bo sazkirin a pîşk ên kesok, gerek bernav a rajêr (**xue**) li pê bernav a kesok a rajor were.

162—Di pîşk ên **saltgîr** de, **bi** dikeve navber a her du bernavan, wek: ez **bi** xue çûm tu **bi** xue hatî.

163—Di pîşk ên **derhingêv** de, eger pîşkberek hebe **bi** dikeve navber a her du bernavan wek: Min **bi** xue **kitêb** kirî, Min **bi** xue li hesp da.

Sazkirin a pîşk ên derhingêv û saltgîr

164—Di kurmancî de ji pîşk ên **saltgîr**, pîşk ên **derhingêv**, bi anîn a xurde ya **andîn** li dû nav ên makderî saz dibin.

wek: ji rev rev**andin**
ji ken ken**andin**

165—ji vî babetî, celebekî dì derhingêv bi berxistin a xurdepêş a **dan** çê dibe; ku jê re derhingêv ên **duser** tê gotin:

wek: ji revandin **dan** revandin
ji kenandin **dan** kenandin

166—ji pîşk ên derhingêv ên xurû bi xue jî bi vî awayî, derhingêv ên duser saz dibin

wek: ji xuarin **dan** xuarin
ji firotin **dan** firotin

167—ji navan û rewşan, bi alîkarî ya pîşk a **kirin** pîşk ên derhingêv saz dibin;

wek: ji navan: ji çav çavkirin
ji rê rê**kirin**
ji rewşan: ji sor sor**kirin**
» » ji reş reş**kîrin**

168—ji rewşan bi alîkarî ya pîşk a **bûn** pîşk ên **saltgîr** saz dibin. wek:

ji sor sor**bûn**
ji reş reş**bûn**

169—Meruv, heywan yan tişt ê ku **bindar** ê pîşkare, jê re pîşkber tê gotin.

wek : Memo **kew** kuşt

**kew** pîşkbere.

170—Pîşkber, bi pirsyarî ya **kê, kî,** û **çi** tê ditin.

wek : Memo **kî** xist? Memo **Ristem** xist!

Memo **kê** dixe? Memo **Ristem** dixe!

Memo **çi** kuşt? Memn **kew** kuşt!

Di van pevekan de **Ristem** û **kew** pîşkber in.

1 — Pîşkber ê durust المفعول الصريح

171—Ew pîşkbere ku di pîşkekî derhingêv de bê têkili ya tişteki di, rast a rast bindar ê pîşkare,

wek : Memo Ristem xist

Memo kew kuşt.

172—Eger pîşkber, meruv be, di çaxa **buhêrkê** de bi kê, tê dîtin, wek : *de bi Kî nuhokê*

Buhêrk: Memo **kî** xist? Memo **Ristem** xist

Nuhok: Memo **kê** dixe? Memo **Ristem** dixe

173—Ew pîşkbere ku, ne rast a rast; bi têkilî ya tişteki dî dikeve ber almanca lêdan a pîşkar, wek: Memo **li** Ristem xist.
Di vê pevekê de pîşkber ne bi ser ê xue ye, çiku di bindarîyê de hevaleki wî heye ku nav ê wî nehatîye gotin. Ew nav, yan ew tişt bi pirsyarî ya **çi** tê ditin.
wek: Memo **çi** li Ristem xist?
Memo **'dar** li Ristem xist
ji lew ra, ji pîşkber ên vî babetî re **pîşkber ên nedurust** tê gotin.

174—**Pîşkber ê nedurust**, di her çaxê de bi pirsyarî ya **kê?** tê ditin, wek:
Buhêrk: Memo li **kê** xist? Memo li **Ristem** xist
Nuhok: Memo li **kê** dixe? Memo li **Ristem** dixe.

175—Pîşkber ê nedurust, bi berxistin a pirs ên wek: **bi**, **di**, **li**, **ji**, saz dibe.

## Kêşan التعريف

174—Kêşan - ji xistin a pîşkekî di qalib ên ku bide zanîn, ew kar bi kê, çi çax û çawa çê bûye re kêşan tê gotin.

wek : ez hatim, tu hatî, ew hat, em hatin hûn hatin, ew hatin.

ez têm, tu têî, ew tê, em tên, hûn tên, ew tên.

ez hatime, tu hatîye, ew hatiye, em hatine, hûn hatine, ew hatine.

Ev pirs ên han giş qalib ên ku pîşkek li gor a **kes** û çax ên newekhev de ketiyê,

## Hêvan ên pîşk

175—Çend sazkir ên pîşk hene ku bê wan çê na be, evin : **kesok, tibab, çax** û **dûzan**, Ku ji van re hêvan ên pîşk tê gotin.

### 1 — kes الشخصي

176—Me ditibû ku her pîşkek, pîşkarekî wî heye. Kêsim û qalib ên pîşkan bi vî pîşkarîve girêdayîye.

Pîşkar yan bi navekî, yan jî bi bernavekî kesok tê xuya kirin, pîşk jî bi qalib ê xue, pêve girêdayîye, ku ji vî kesokî re kesok ê pîşk tê gotin.

177—Di pîşkekî de sê kes hene:

1 - Ê ku dipeyive, jê re **peyvok** tê gotin. wek: **min** kir, **ez** dikim

2 - Ê ku guhdare, jê re **dîyar** tê gotin wek: **te** kir, **tu** dikî

3 - Ê ku peyv li ser wî ye û ne li diyare, jê re **nediyar** tê gotin. wek: **wî** kir, **ew** dike.

## 2 — Tibab الكمية

178—Pîşk jî wek navan bi du tibabaye: **tek, kom**.

179—Tibabî ya pîşkan bi yekbûn û pirbûn a pîşkar û pîşkberve girêdayîye.

1 - Eger pîşkar û pîşkber tek bin, pîşk jî teke:

wek: Memo hat, Memo Bozo xist

Di van her du pevekan de pîşkar û

pîşkber tekin, pîşk jî teke.

2 - Eger yek ji her duwan, yan jî her du bêtirî yekî bin, pîşk jî kome.

wek : **Memo** û **Bozo** hat**in**

Memo **Bozo** û **keleş** xist**in**

di van her du pevekan de, a pêşîn pêşkar û di a paşîn de pîşkber du meruvin ji ber vê pîşk kome

### 3 — **çax** الزمان

180—Kirin giş di çaxekê de nabe û çax jî tîm di demekê de namîne, her tê û dibuhure.

Ji ber vê, pîşk bi çaxêve girêdayîye, hin movik û xurde yên pirsan hene ku bi pîşkve têne girêdan çax a qewimandinê didin xuya kirin.

wek : çû çû**ye** **di**çe **ê bi**çe..

parçe yên wek **ye**, **di**, **ê**, **bi** ku bi pîşkve hatine girêdan çax a ku pîşk tê de qewimîye didin xuya kirin.

181—Di pîşk de **sê** çax hene :

1 - çox a buhurî, jê re **buhêrk** tê gotin, min **do** kirî

2 - çax a ku em tê de ne, jê re **nuhok** tê gotin: ez **nuha** di kirim

3 - çax a ku hêj ji wêve tê, jê re **mand** tê gotin: ez **ê bi**kirim

182—Du celeb buhêrk hene : nêzbuhêr, mêjbuhêr :

1 - **Nêzbuhêr** — Eger me kirin û bûn a pîşk bi çav ê xue dîtibe, yan ji bûn a wî bawerbin, em ê bibêjin: çûm, hatim.

2 - **Mêjbuhêr** — Eger me kirin û bûn a pîşk bi çav ê xue ne dîtibe, yan jî ji bûn a wî ne bawerbin, yan jî di çaxek dûrtir de qewimîbe em ê bibêjin :

çû**me**, hati**me**, çû**ye**, hati**ye**

3 - Eger pîşk di çax a nuha de diqewime, em ê bibêjin :

**di**çim **tê**m **di**çe **tê**

4 - Eger pîşk hêj ne bûye, le ew ê di pêşîyê de biqewime em ê bibêjin :

ez **ê bi**çim ez **ê b**'êm

183—Pirs a ku bê têkilî ya kesan û çaxan kirinekê, bûnekê, havilekê bide zanîn jê re **makder** tê gotin·
wek: ketin, kirin, xistin, çûn..
Ev her çar pirs her yek bê têkilî ya çaxan û kesan kirinekê tînîn bîr a me.

184—Di her makderekê de du parçe hene: pêşing, paşing, wek: ket in.
parçe yê **ket** pêşing û **in** paşinge.

185—Di kurmancî de tîp a paşî ya pêşingê tîpek bê deng be paşing **in** e. wek: ketin
Eger tîpek dengdar be paşing **n** ye. wek: çû**n**.

186—Di Kurmancî de tip ên paşî ya pêşingan evin ; **a, d, î, r, t, û, ya**

| | | |
|---|---|---|
| **a** - d**a**n, z**a**n | — | d**a**, z**a** |
| **d** - xuen**d**in, çan**d**in | — | xuen**d**, çan**d** |
| **î** - kir**î**n, bir**î**n | — | kir**î**, bir**î** |
| **r** - ki**r**in, bi**r**in | — | ki**r**, bi**r** |
| **t** - ke**t**in, xis**t**in | — | ke**t**, xis**t** |
| **û** - ç**û**n, b**û**n | — | ç**û**, b**û** |
| **ya** - girî**ya**n, revi**ya**n | — | girî**ya**, revi**ya** |

187—Her makder wek kom a kesok ê sisyan di buhêrkê de ye. wek : **ketin**.

Pirs a ketin bi ser ê xue kare ketin a çend meruvan, çend heywan û çend tiştan nîşan bide, wek: Memo, Bozo û Qenco **ketin**, tu ferq di navber a her du **ketin**an de na ê ditin.

188—Herçi çax ên buhêrkê ji paşingê saz dibin : **ket** pêşing a ketine.

Memo **ket**, Memo keti**ye**, Memo keti**bû**.

189—Çax ên nuhok û mand, ji ferman ê çê dibin û ferman bi hilanîn a tîp a paşî ya pêşingê çê dibe:

wek : ji ketin bi hilanîn a paşingê **ket** û bi hilanîn a **t** ferman çê dibe ku eve: **ke**; çax ên nuhok û mand giş ji vî parçe yê mayî saz dibin.

190—Herçî makder ên ku **s** yan ş di wan de hebin di fermanê de **s** dibe **z** û ş dibe **j**.

wek: ji bihistin dibihî**z**im bibihî**z**e

ji rêştin dirê**j**im birê**j**e

191—Di kurmancî de hin pîşk hene ku di navber a makder û fermanî ya wan de newektî tê dîtin.

Ev jî du birin: ên ku di fermanîyê de tipne derî makderê di wan de tê dîtin ku em karin nav ê van bikin **biramak** û ên ku makder û fermanî ne yekin, ango fermanî ne ji kok a makderêye ku em ji van re karin **dubirak** bibêjin.

a - Pîşk ên biramak - ew pîşk ên ku di fermanîyê de zêdeyî makderê tip di wan de tê dîtin.

wek: **avêtin, dotin, firotin, ketin, gotin mêtin, rêtin.**

Fermanî yên van makderan evin:

avêj = di avêjim, bi avêje

doş = didoşim, bidoşe

firoş = difiroşim, bifiroşe

kev = dikevin, bikeve

koj = dikojim, bikoje

mêj = dimêjim, bimêje

rêj = dirêjim, birêje

ji van fermanîyan xuya dike makîyên van makderan evîn:
avêştin: doştin, firoştin, kevtin: koştin, mêştin, rêştin.

b - Pîşk ên dubirak - Hin fermanî hene bê makderin. wek: **bêj**, **bîn**
Bi nav ê bêjtin û bîntin tu makder pêde nabin, le çax ên nuhok û mand giş li ser van her du pirsan ava dibin bê î ku çax ê wan ên buhêrk hebin.

| | | |
|---|---|---|
| wek : | di bêjim | bibêje |
| | di bînim | bihîne., |

Buhêrkên wan ji **gotin** û **dîtin** saz dibin

| | | |
|---|---|---|
| wek : min **got** | min **gotîye** | |
| ez di**bêjim** | ez ê **bibêj**im | |
| min **dit** | min **dîtî**ye | |
| ez di**bîn**im | ez ê bi**bîn**im | |

c-Hatin, û xistin -Hatin fermanî ya wê **ê** ye di nuhokê de **a** dibe **ê** û **h** hatîye avêtin maye **ê** ji xue li gor a rêzanê gerek fermanî ya wê **hê** bûya, le di peyvê de maye **ê**.

wek ez têm tu têî ew tê.,.

Pîrs a xistin - di fermanîyê de li gor a rêzanê gerek **xlz** bûya le bervaji hew xi yan x maye, wek: ez dixim tu dixî, ew dixe tê gotin.

Sazkirin a çaxan

192—Çax ên buhêrk ji pêşingê û ên nuhok û mand ji fermanîyê saz dibin.

Çar buhêrk hene: nêzbuhêr, mêjbuhêr, mêjbêj buhêrkbej

a - Nêzbuhêr - Bi hilanîn a paşingê ji makderan saz dibe.

Eger pîşkekî derhingêv be (متعدي) pêşing rast a rast nêzbuhêre

wek : ji kirîn

min **kirî**, te **kirî** wi **kirî**

me **kirî**, we **kirî** wan **kirî**

Eger pîşkekî saltgîr be (لازم), bernavên **dûmdar** bi pêşingêve têne girêdan.

wek : ji hatin.

ez hat**im** tu hat**î** ew hat

em hat**in** hûn hat**in** ew hat**in**

b - Mêjbuhêr - ji pêşingan saz dibe.

Eger pîşkekî derhingêv be **ye** li dû pêşingê tê.

wek :min kirî**ye**, te kirî**ye**, wî kirî**ye**

me kirî**ye**, we kirî**ye**, wan kirî**ye**

Eger pîşkekî saltgîr be li dû bernav ê kes ê peyvok **e** û li dû guhdar û nedîyar **ye** li dû koma her sêyan **e** tê.

wek :

| | | |
|---|---|---|
| ez hatim**e** | tu hati**ye** | ew bati**ye** |
| em hatin**e** | hûn hatin**e** | ew hatin**e** |

c - Mêjbêj - bi anîn a pêşing a pîşk a **bûn** li dû pêşingê saz dibe

wek :

| | | |
|---|---|---|
| min kirî**bû** | te kirî**bû** | wê kirî**bû** |
| me kirî**bû** | we kirî**bû** | wan kirî**bû** |

Di pîşk ên saltgîr de bernav ên dûmdar li dû **bû** tên.

wek :

| | | |
|---|---|---|
| ez hati **bû**m | tu hati **bû** | ew hati **bû** |
| em hati **bû**n | hûn hati **bû**n | ew hati **bû**n |

d - Buhêrkbêj - Bi anîn a dı berî pêşingê saz dibe wek :

| | | |
|---|---|---|
| min dı kirî | te dı kirî | wî dı kirî |
| me dı kirî | we dı kirî | wan dı kirî |
| ez dı hatin | tu dı hatî | ew dı hat |
| em dı hatin | hûn dı hatin | ew dı hatin |

حال مستقبل

193—Çax ên nuhok, mand û pêşro (مضارع) ji fermanîyê saz dibin.

Ev her sê çax ji bo her du celeb pîşk bernav ên salt distînin.

a - Nuhok حال bi pêşxistin a dı û dûxistin a dûmdar bi fermaniyê re saz dibe.

Eger tîp a ser ê pîşk dengdarek be dı dibe t.

| | | |
|---|---|---|
| wek : Ez dı kirim | tu dı kirî | ew dı kire |
| em dıkirin | hûn dıkirin | ew dıkirin |
| ez têm | tu têî | ew tê |
| em tên | hûn tên | ew tên |

b-Mand مستقبل -Bi berxistin a(ê,bı)û dûxistin a bernav ên dûmdar sez dibe.

wek : ez ê bıkirim, tu ê bıkirî, ew ê bıkire

em ê **bi**kirin, hûn ê **bi**kirin, ew ê **bi**kirin.

c - Pêşro (مضارع) -Bi pêşxistin a **bi** û dûxistin a bernav ên dûmdar saz dibe

wek :

ez **bi**kirim, tu **bi**kirî, ew **bi**kire
em **bi**kirin, hûn **bi**kirin ew **bi**kirin

(Rist) Dûzan الصيغة

194—Dûzan ew şax ên pîşkanin ku awa yên ravekirin a kirinê pêş dikin.

Di pîşkan de ji havil a çaxan pêve awa yên ravekirin a kirinê heye. wek: çûm çûme, diçim, ê biçim. Ev her çar çax ên xurû bûn a karekî di kînga de çêbûye yan hêj ew ê çê bibe pêş me dikin. Le ku min got : çûbim, biçûma, îcar bi van pirsan ne bûn a karekî di çaxekê de, bervajî hêvî û lavayî ya xue ji bo bûn a wî beyan dikin.

---

**Mand** — Kurmanc dibêjin « ez berxekî fro bi beranekî mandê nadim » ango bi beranekî mustegbel nadîm.

195—Du celeb dûzan hene, gur الخبر û bir الشرط

a - Dûzan a gurê sê çax ên xurû û hevbend ên wanin, ku buhêrk, nuhok û mand û ên ji wan zêde dibin. Ku me ew beyan kirine.

b - Dûzan a birê - şeş şaxin: lajiv, gûman, bijoke, nuhgo ya lavij, nuhgo ya gûman nuhgo ya bijokene.

Lavij - bi berxistin a **bi** û bi pêxistina **a** yan **ya** li dû pêşingê saz dibe: wek: ez biçûm**a**, tu biçû**ya**, ew biçû**ya**, em biçûn**a** hûn biçûn**a**, **ew** biçûn**a**.

Gûman - ji pêşingê û fermanî ya pîşk a bûn **bi - be** saz dibe: ez çû**bi**m, tu çû**bî** ew çû**be**, em çû**bin**, hûn çû**bin**, ew çû**bin**.

Bijoke - ji pêşingê û pêşing a pîşk a **bûn** saz dibe wek : ez çû**bûma**, tu çû**bûya**, ew çû**bûya**, em çû**bûna**, hûn çû**bûna**, ew çû**bûna**.

Nuhgo ya lavij : ez **ê** biçûm**a**, tu **ê** biçû**ya** ew **ê** biçû**ya** em **ê** biçûn**a**, hûn **ê** biçûn**a**, ew **ê** biçûn**a**.

Nuhgo ya gûman - ez **ê** çû**bim**, tu çû **biê** ew **ê** çû**be**, em **ê** çû**bin**, hûn **ê** çû**bin**, ew **ê** çû**bin**.

Nuhgo ya bijoke - ez ê çû**bûma**, tu ê çû**bûya** ew ê çû**bûya**, em ê çû**bûna**, hûn ê çû**bûna** ew ê çû**bûna**.

## Pîşk a alîkar

196—Di kêşanê de du çax tên dîtin: xurû û dumil.

197—Çax ên **xurû**, ên ku ji yek pirsê hatine saz kirin wek: çûm, çûme, diçim.

198—Çax ên **dumil**, ên ku ji du pirsan hatine saz kirin, wek: **çûbûm**, çû bûm pirsek du mile ango jj du pirsan saz buye. çûn û bûn .

wek: çû**bûn**, hati**bûn**, kirî**bûn**, firoti**bûn**.

199—Çax ên dumil gîş buhêrkin.

## Di pişkan de nebûn النفي

200—Gav a ku yekî pirsî û got: Bav ê te çû? ji vê pirsyarîyê re du bersiv hene: ya **erê** û

yan **na**! eger ne çûbe, **na** neçû, tê gotin. Ji vî awa yê nebûnê re nebûn a pîşkan tê gotin.

201—Nebûn bi **na** û **ne** saz dibe.

a - Di çax ên buhêrkê de nebûn bi **ne** pêk tê.

wek: Keleş **ne** çû. Ristem **ne** kirî

b - Di çax ên nuhok û mandê de, bi **na** sazdibe

wek: Keleş **na**çe Ristem **na**kire.

202—Eger pîşk dumilbe **ne** û **na** dikevin navber a xurdepêşê û pîşk a makî.

wek: ji hildan:

Bozo hilda — Bozo hil**ne**da

Bozo hil **di**de — Bozo hil **na** de

203—Di çax ên nuhok û mandê de **ne** û **na** şûn a tîp ên nuhokbêj û mandbêj (**di**, **ê**, **bi**) digre

wek: Remo **di** çe — Remo **na** çe

Remo **ê** **bi** çe — Remo **na** çe

204—Bi homayî, bersiv a hebûnê **erê** û a nebûnê **na** ye.

## Pirsyarî

205—Di Kurmancî de **pirsyarî** bi dirêjkirin a deng ê paşîn çê dibe.

Eger ez pirsyarî ya çûn a Keleş bikim, ez ê bibêjim: Keleş çû? deng ê **û** ez ê dirêjtir bikim.

206—Pirs ên wek **ma, gelo** bi kêrî pirsyarîyê tên wek: **ma** çû? **gelo** hat?..

### Çêkirin a pîşkar û pîşkber تشكيل فاعل ومفعول

207—Di Kurmancî de ji bo çêkirin a nav ê pîşkar tu rêzan pêde nabin. Ji bo pîşkar bernav a pêgih vî cî digre. wek: **ê ku** kitêb xuend, **ê ku** hesp firot.

Carna xurdepaş a **ende** pîşkar saz dike. wek: ji dirîn dir**ende**

ji gewz gewz**ende** yan gew**ende**

208—Nav ê pîşkber bi anîn a xurde ya **î** li dû pêşingê saz dibe.

wek: ji firotin firotî

ji ketin ketî...

209—Xurdepaş ên wek **a, ar, e, ok, wer** nav ên pîşkar bi zêdayî saz dikin. wek:

| | | |
|---|---|---|
| **a** : | ji zanîn | zan**a** |
| | » bezîn | bez**a** |
| | » xuendin | xuend**a** |
| **ar** : | » xew | xew**ar** |
| | » kevn | kevn**ar** |
| **e** : | » xuarin | xur**e** |
| | » palî | pal**e** |
| **ok** : | » ken | ken**ok** |
| | » rev | rev**ok** |
| **wer** : | » bîr | bîre**wer** |

## Pîşk ên dumil

210—Di Kurmanci de du celeb pîşk hene : xurû û dùmil.

Ên xurû ew pîşk ên ku ji yek pirsê ne. wek : ketin, çûn' hatin' firotin

Ên dumıl, ew pîşk ên ku ji xurdepêşekê û pîşkek xurû saz bûne. wek : **da ketin ra ketin, vê ketin**.

Ev her sê pîşk mak a wan yekin, ango her sê ji ji **ketin** saz bûne, le her yek manakê dide.

211—Xurdepêş ên ku pişk ên dumil ( xurdezad مشتق ) saz dikin evin: **da**, **hil**, **ra**, **ve**, **vê**.

**da** — **da** dan, **da** ketin, **da** xistin
**hil** — **hil** dan, **hil** ketin, **hil** xistin
**ra** — **ra** dan, **ra** ketin, **ra** xistin
**ve**, **vê** — **ve** dan **ve** ketin, **vê** xistin..

212—Pîşk ên xurdezad gav a ku nebûn di wan de hebin **ne û na** dikevin navber a xurdepêşê û pîşk a makî, wek :

| | | |
|---|---|---|
| ji dadan | da **ne** da, | da **na** de |
| » hildan | hil **ne** da, | hil **na** de |
| » raxistin | ra **ne** xist, | ra **na** xe.. |

## Serwer û salix المبتدأ والخبر

213—Serwer û salix du pirsin,ji wan pevekek saz dibe, wek: buhar xueşe, tirî şêrine. buhar û tirî **serwer**, xueş û şêrîn **salixin**. Ji bo nasîya serwer û salix ji hev, gerek serwer li pêş **û** salix li dû be, a pêşîn sergotin û a paşîn salixdane.

214—Eger salix rewşek be,ew pevek, pevekek

navdare, eger pîşkek be ew pevek,
pevekek pîşkdare

wek : buhar **xueşe**, ev pevekek navdare
جملة اسمية

Keleş hat, ev pevek pîşkdare جملة فعلية

215—Pir caran serwer, li şûn a nav bernaveke, wê hingê bernav ê dûmdar li dû salixdanê tê

wek : **tu** jîrî, **ez** ne xueş**im**

216— Carna serwer **nîreke**, wek: **vir** bajare

217— Di pevekê de **nebûn** hebe, **ne** berî salix tê wek: Zivistan **ne** xueşe, tu **ne** jîrî, vir **ne** bajare.

218— Pêrbest, berî salix tê. wek : Keleş **ji** rindane ez **ji** gundim.

Eger-salix pîşkek be, ew pevek pîşkdare.

wek ; Qenco hat. Bozo çû

Pêrbest û ne bûn berî salixê tên.

wek : Qenco **ji** gund hat. Bozo **ne** çû.

## Pîşk ên derhingêv

### Bihîstin

Dûzan a gur الصيغة الاخبارية

**Nêzbuhêr**
الماضي القريب او الشهودي

Min bihîst
te bihîst
wî bihîst
me bihîst
we bihîst
wan bihîst

**Mêjbuhêr**
الماضي البعيد

Min bihîstiye
te bihîstiye
wî bihîstiye
me bihîstiye
we bihîstiye
wan bihîstiye

**Nuhok** الحال

ez dibihizim
tu dibihizî
ew dibihîze
em dibihîzin
hûn dibihîzin
ew dibihîzîn

**Mand** المستقبل

ez ê bibihîzîm
tu ê bibihîzî
ew ê bibihîze
em ê bibihîzin
hûn ê bibihîzin
ew ê bibihîzin

**Pêşr** المضارع

ez bibihîzim
tu bibihîzî
ew bibihîze
em bibihîzin
hûn bibihîzin
ew bibihîzin.

**Mêjbêj** الرواية

Min bihîstibû
te bihîstibû
wî bihîstibû
me bihîstibû
we bihîstibû
wan bihîstibû

**Bûhêrkbêj** الحكاية

Min dibihîst
te dibihîst
wî dibihîst
me dibihîst
we dibihîst
wan dibihîst.

**Lavij** التمني

Min bibihista
te bibihîsta
wî bibihista
me bibihîsta
we bibihîsta
wan bibihista

**Bijoke** التعجب

min bihistibûya
te bihîstibûya
wî bihîstibûya
me bihîstibûya
we bihîstibûya
wan bihîstibûya

**Gûman** الشبهة

min bihistibe
te bihistibe
wî bihîstibe
me bihîstibe
we bihîstibe
wan bihîstibe

**Nuhgo ya lavij**
التمني الحال

min ê bibihîsta
te ê bibihîsta
wî ê bibihîsta
me ê bibihîsta
we ê bibihîsta
wan ê bibihîsta

**Nuhgo ya bijoke**
التعجب الحال

min ê bihîstibûya
te ê bihîstibûya
wî ê bihîstibûya
me ê bihîstibûya
we ê bihîstibûya
wan ê bihîstibûya

**nuhgo ya gûman** الشبهة الحال

min ê bihîstibe
te ê bihîstibe
wî ê bihistibe
me ê bihistibe
we ê bihîstibe
wan ê bihîstibe

**Fermanî**

Bibihîze
Bibihîzin

# Bir X

## b - Pirs ên neguhêz

### Nîr(1) نظرف

219— **Nîr** - çawa kû mane ya navan bi navne dî û rewşan temam dibin, mane ya rewşan û pîşkan jî bi **nîr** an têne temam kirin.

wek : Memo kurekì **pir** jîre, ders a xue **zû** ezber dike. Di vê peveke de ( **pir**, **zû** ) **nîr**.n.

Ji ber vê ew pirs a ku bi kêrî temam kirin a mane ya rewşekê, pîşkekê were; jê re **nîr** tê gotin

220 - Carna nîr ji çend pirs ên hevbend saz dibe ku ji van re **hevbend ên nîrî** tê gotin. wek: **rû bi rû**, **pê der pê**, **pê bi pê**, **rast a rast**...

---

(1) **Nîr** - Kurmanc dibêjin, îro nirekî tenge, tu di nirekî baş de hat ango iro zerfeki tenge tu di zerfekî baş de bat. Ji ber vè nîr bi temamî zerfe.

221— Şeş bêş nîr hene: Nîr ê rasteder, nîr ê tibab, nîr ê çax, nîr ê lûs, nîr ê hebûn, nebûn û gûman, nîr ê pirsyarî.

1 —Nîr ê rasteder

222—Nîr ê rasteder bi pirsyarî ya **çawa**? tê dîtin. wek : tu **çawa**yî? ez **baş**im. Di vê bersivê de pirs a **baş** nîreke.

223—Pêşdetir ê nîr ên rasteder evin :

**baş, rind, qenc, rast, durust, weh, wehsan** ( **h** na ê xuendin -wesa tê gotin )

2 — Nîr ê tibab

224—Nîr ê tibab, li pirsyarî ya **çend** û **çiqand** vedigerîne. wek:

Pez ê Memo **çi qande**? pez ê Memo **pire**. Pirs a **pir** nîrekî tibabe, ango tibabekî dide xuya kirin.

225—Pêşdetîr ên nîr ên tibab evin :

**çend, hew, ew çend, ev çend, ev qand hinde, çiqand, gelek, pir, hindik**.

3 — Nîr ê çax

226—Nîr ê çax li pirsyarî ya **kînga**? û **çiçax**?

vedigerîne, wek :

Tu **çiçax** hatî? ez **îro** hatim,

Pirs a **îro** nîrekî çaxe.

227—Pêşdetîr ên nîr ên çax evin :

**îro, îşev, îsal, nuha, do, pêr, par, pêrar, zû, dereng, tavil, hêj, mêj, kînga, îdî.**

4 — Nîr ê lûs

228—Nîr ê lûs li pirsyarî ya **kû**? vedigerîne wek: Tu li **kû** bû? ez li **hundur** bûm.

Pirs a **hundur** nîrekî lûse.

229—Pêşdetîr ê nîr ên lûs evin:

**der, hundur, dûr, nêz, ser, bin, pêş, paş, nav, vir, wir**

5— Nîr ê hebûn û nebûn û gûman

230—Nîr ê hebûn - bi kêrî ravekirin a hebûnekê tê.

231—Nîr ê hebûn eve: **erê**

wek : Ma Memo îro diçe? **erê** Memo îro diçe! ji ber vê **erê** nîr ê hebûnêye

232—Nîr ê nebûnê, nebûnekê pêş me dike eve: **na**!

wek : Ma Memo îro diçe? **na** Memo îro naçe !

233—Nîr ê gûman- hebûn û nebûnê bi gûman pêş me dike.

234— Ên Pêşdetîr evin : **dibe, gûman dikim, bê, bêgûman, başe, xuezî, xuedê giravî, belkî, gerek, eger.**

wek : Tu kînga diçî? **belkî** îro biçim.

6 - Nîr ê pirsyar

235—Ji van nîr ên ku bi kurtî me jimartin nîrekî dî heye bi kêrî pirsyarîyê tê ku jê re nîr ê pirsyarî lê gotin.

235—Pêşdetîr ê nîr ên pirsyarî evin : **ma, gelo, k nga, kû, kî, kê, çi, kîye, çiye?..**

wek : **Ma** tu **kînga** diçî?

ew li **kûye**? ew **çi** tişte?..

237—Du bêş pirsyarî hene :

pirsyarî ya **durust**, pirsyarî ya **nedurust**.

238—Pirsyarî ya **durust**, rast a rast, bê pirsek dî kare were gotin. wek : **kîye? çiye?...**

239—Pirsyarî ya **nedurust**, bi tenê na ê gotin gerek bi pîşkekê re bê, wek : tu **kînga** diçî ? Memo çiçax hat?...

240—Peyv dibe ku ji gelek **pevekan**, pevekek ji gelek daxuaz û **guftan**, guftek ji gelek **pîşkar**, ji gelek **pîşk**, ji gelek **pîşkber** saz bibe, ji bo girêdan a yekê bi a dî re pirsek xueser heye ku jê re **pêwend** tê gotin.

wek: Ristem **û** Zoro çûn nêçîrê **le** tu ne kuştin **û** vala vegeriyan..

Di vê pevekê de **û**, **le** pêwendin.

241—Di guftêde **nav** dikeve kiras ê **pîşkar**, **pîşkber ê durust pîşkber ê nedurust** çare û rê ya naskirin a pîşkar û pîşkber ê durust me dîtine. Le pirsek heye ku pîşkber **nedurust** dike, ku ev pirs **pêrbeste**. Gav a ku min got: Ristem Keleş xist; di vê pevekê de pîşkber duruste.

Le ku min got: Ristem **li** Keleş xist, îcar pîşkber neduruste. Ji ber ku Ristem bi **tîştekî** li Keleş xistiye, ango bi pîşkber - Keleş - re pîşkberekî dî heye, dareke, yan kevireke, yan tişteki ku nav ê wî ne hatiye gotin.

242—Pirs ên wek **li**, **bi**, **di**, **ji**, **re** pîşkber nedurust dikin, ku ji van re **Pêrbest** tê gotin.

# Bir XI

**Pêrbest** حرف الجر

243—Pêrbest pirsek neguhêze ku navan û bernavan dike **pîşkber ê nedurust** wek : Min qelemek **ji** kur ê xue **re** kirî. Divê pevekê de **ji**, **re** pêrbestin.

244—Pêrbest ên pêşdetir evin : **bo, bi; di, ji, li, re, ango, paşê, qandî ji bo, li pêş.**

# Bir XII

## **Pêwend** حرف العطف

245—Pêwend pirsek neguhêze ku pirs ên wek hev yan guft ên wek hev di pevekekê de bi hev dide girêdan, ev jî du birin : pêwend ên **durust**, ên **nedurust**.

246—Pêwend a **durust** - çend pirs ên neguhêzin ku karin çeng û libat ên pevekê bi hev bide girêdan.

wek : Memo **û** Bozo heval ên hevin.

Ristem îro çû, **yan** do?

Ev pîrs ên wek **û**, **yan** pêwendin çiku parçe û çeng ên van her du pevekan gihandine hev.

247—Pêwend ên pêşdetîr evin : **yan**,**le û ne**. .**ne**, **jî**. wek: Remo **ne** diçe **ne** dimîne, **le** belkî îro here.

248—Pêwend a **nedurust** - pirsek neguhêze, du guftan yan du pevekan digihêne hev.

wek : Qenco hesp ê xue firot **ku** mihî-
nekê bikire.

246 —Pêwend ên nedurust ên pêşdetir evin :
**ku, ji ber ku, çiku, ji bo ku, wek, mîna, hem,**

**wek, mîna** — du pirs yan du bir pirs ên wek hev didin berhev.

wek: Ristem ji **wek** Keleş welatperwere Kurdistan jî **mîna** Îran welatekî xuesere !

# Bir XIII

**Bang** النداء

250—Bang pirsek neguhêze ku **kêf, êş, xueşî** yan **bêkêfî** ya meruv dide xuya kirin, wek **gazî, ken, girî**..

251—Bang ên pêşdetir evin : **xuezî, gelo, haho, of, ax ay**.

wek : **xuezî** me Kurda azadî bidîta !

**gelo** em ê kînga bi ziman ê xue bixuînin !

**of** çi buharek **xueş**!..

# Dawî

DIYARIYA KEMBAL OFFERT PAR



INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 471 09